

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 60 | 2014



Du pirtûkên dersên KURDÎ-kurmancî li Swêdê hatin weşandin



Du pirtûkên nû yên dersên **KURDÎ/kurmancî** li Swêdê hatin weşandin. Pirtûk ji alî mamosteyê dersên zimanê kurdî Haluk Öztürk ve hatine amadekirin û di nav Weşanên APECê de derketine. Herdu pirtûk ji bo şagirdên dibistana pêşîn, polên 1-3 ne. Ji van “KURDÎ-Kurmancî” rêzmana kurmancî ya ji bo zarokên dibistanê yên polên pêşîn e. Ew seranser ji gelek wêneyên rengîn û ji 64 rûpelan pêkhatiye. Spartinên wê hêsan û berbiçav in. Şagird dikarin serbixwe bixebitin.

Pirtûka duwem **Heywan-Deftera Temrînan 1** materyaleke fêrkirina navên heywanan e, herwisa ji ji bo pêşxistina şîyana xwendin û nivîsandinê ye. Pirtûk bi bergekî rengîn û ji 24 rûpelan pêkhatiye. Wêneyên gelek heywanan ji bo ku şagird bi xwe birengînin hatine nexşandin.

Herkes dikare pirtûkan ji malperê Weşanxaneyê APEC spariş bike. Sparişên xwe ji ev e-mailên li jêr re bişînin:

Swêd: info@apectryck.se

Almanya: birnebun@hotmail.de



SERSAXÎ



Mehmet Özkan 03.02.1950 - 26.10.2014

*Berlin`den Xelikan`a
bir yol uzanır gider
bitmez ve tükenmez
Hasret yoklar ikidebir
Güzel gençlik anıları hatırlanır
Derin derin
Rüyalar süsler günü*

*Berlin`den Xelikan`a
bir yol uzanır gider
bitmez ve tükenmez
Yolcu yorgun mu yorgun
Sabahın kuş seslerine uyanmaz*

Seyfi Doğan

Hevalbendê me û dostê kovara Bîrnebûnê û welatparêzê hêja,
Mehmet Özkan di 26 meha 10an de cû ser rehma xwe.

Mehmet Özkan bi xebat û berhemên xwe dê her tim di bîra me da be!..
Em ji malbat, heval, dostên wî û gelê kurd re sebir û ser saxê dixwazin!

Redaksiyona Bîrnebûnê

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 60 | 2014

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit
Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mih, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebn.com

Internet:

www.birnebn.eu

Tekili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medyta Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İşveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İşveç dışındaki aboneler için

APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro—Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec—Tryck AB



Mala Hecibegê, salên 1940î, gundê Mikaila/İnler

Wêneyê berg: Top û Xetica Hecibegê

Ev wêne li salên 1940î li gundê Mikaila/İnler hatiye girtin.

Ji arşîva Dr. Mikailî

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almaniyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçî
- Li Anatoliya Navîn Havîna 2014an 7
Adem Özgür
- Mirina hevalê min î hêja Mehme Hemê 9
Nuh Ateş
- El-Malîkî "Dergevanê agir" û çekirê "Ieylanê!" 12
Dr. Sozdar Mîdî
- "Mîrê Kurdistanê" Kakelo 14
Rohat Alakom
- Helbest 21
Seyfî Doğan
- Şopên dema xatirxwastinê -VI- 22
Nuhê Hecî Malê Herşîd
- Gotûbêj 26
H. Duzen:
- Ezidiler, inançları ve tarihleri 36
Prof. Dr. İlhan Kizilhan
- 57 Lorîn
Mem Xelîkan
- 58 Keyerl Johann Wolfgang von Goethe
Werger: Nuh Ateş
- 60 Şepçe
Seyfî Doğan
- 63 Şemşê
Ersin Taşkıran
- 66 Şengal
Mem Xelîkan
- 67 Pakijî
Seyfî Doğan
- 69 Fazîletên entelektuela
Seyfî Doğan
- 70 Sîyarê Têrika-3
Dr. Mikailî
- 78 "Kesek tune ku jîyana min binivîse?"
Suphî Aydin

Ji bîrnebûnê

Mafê însanî mafekî rewa ye ku ji her kesî re pêwîst e. Di dîroka însanîtiyê de ji ber mafên însanî di navbera mazlum û zaliman, edalet û bê edaletiyê de şer çêbûne û her berdewam in.

Di ev sedsala nu ya modern de bi destê çeteyên wek DAIŞê li ser axa Kurdîstanê, ji destpêkê li dijî kurdên me yên êzîdî komkujî û êrîşên dijwar hatin kirin û li vê dawîyê jî li seranserê sinorên Kurdîstanê û bi taybetî jî li Kobanê êrîşên dijwar têne kirin. Ev komkujî û tofana ku hatiye serê xelkê me û di van mehên zivistanê de însanên me mecbur mane li ser axa xwe, careka din koçber û pêrîşan, di çadiran de bijîn!.. Ev ji alikî de me gelek xemgîn dike.

Lê ji aliyekî din de ev berxwedan, piştgirî, yêkîtî û tevgerîya hêzên kurdan, ji her aliyê Kurdîstanê, dema diçin hewara hev, yêkîtiya netewî, ji Anatolîyê heta Xoresanê, ji her aliyê Kurdîstanê ve xortir û bi bîrûbawerî dike. Dilê me gelek şa û bi hêvî dike û dilê dujminên ku digotin; "*Koban ha ket, ha dikeve*" jî xira û dildeng dike.

Îro, li dijî ev êrîşên hovane yên li dijî însanîtiyê ku li seranserê welatên dunyayê, ji derweyê welatên aligirên wan yên wek (Turkiye, Îran û hevalbendên wan) ku têne lanet kirin, şerwanên kurd, partiyên kurdan, bi kudret karibûn li hember wan ç-

teyên DAIŞê, axa xwe, namusa xwe û însanîtiyê biparêzên û her bi ev tevgerîya xwe, ji hemû dunyayê re jî nîşan dan ku li hember van êrîşên hovanê, bi tena serê xwe bin jî, dikarin berxwe bidin.

Di wan rojên tarî yên zivistanê de her ciqas em bi fizîkê ne li nav ev însanên xwe yên ku pêrîşan û aware bûne re bin jî, dilê me û hişê me her bi wan re ye. Êşa wan êşa me ye jî!..

Kurdên Anatolîyayê li welêt û li derveyî welêt jî, bi her awayî bi tewgera kurdî ra, li dijî ev êrîşên li Kobanê û li başûrê Kurdîstanî dibin, bi xortanî disekinîn.

Dostê kovara Bîrnebûnê û welatparêzê hêja, Mehmet Özkan di 26 meha 10an de çû ser rehma xwe. Mehmet Özkan bi salan madî û manewî piştgirîya kovara me, li xerîbîyê dikir. Yarmetiya wî di derketina kovarê de bê hempa bû.

Jîyana xwe wek pîraniya kurdên li derweyî welêt, bi hesreta cîh û warên dê û bawê xwe, axa welêt, çav li rê, derbas kir û li Almaniyayê, bê xatir xwestin ji nav me çû ser rehma xwe... Ew dê her tim di bîra me da be!..

Em ji malbat, heval, dostên wî û gelê kurd re sebir û ser saxê dixwazin!

Bi hêvîya serkeftin û azadiyê, bimînin di xêr û xwaşiyê de!..

Alî Çiftçî

Li Anatoliya Navîn Havîna 2014an bi festîvalan derbas bû...

Adem Özgür



Dîmenek ji festîvala Omeran

Foto: Hacı Güneş

Havîna isal bi festîval û şenahiya derbasbûn. Di havîna isal da li Încowê, Omeran, gundê Omê û Aksarayê festîval hatin lidarxistin.

Li Încowê, di roja 15ê hezîranê de festîvala 3. a Xermana ya Încowê hat li dar xistin. Di festîvalê de ji xêrî gundiyên Încowê kurdên gundên dor aliye Încowê jî beşdar bûn.

Di festîvalê de Stranbejên wek Raperîn û Cevdet Bağca û stranbejên meheli jî wek Yusuf, Mehmet Töre û Ezman Stêrk derketin ser dîkê. Bi çoşeka mezin civana govend girtin. Wek siyasetmedar jî serokê DBP yê bajarê Konya, Parlamenterê CHPê

Atila Kart, ji Konyayê, Cihanbeyli û Kuluyê jî siyasetmedarên meheli beşdarbûn.

Li Omera "*II. Festîvala Kurdên Anatoliya Navîn*" bi amedekirina Platforma Kurdên Anatoliya Navîn di roja 3 tebaxê de hat lidarxistin. Nêzikî deh hezar kes beşdarî festîvalê bûn. Di festîvalê de wek stranbejên meheli Serbülent Kanat, Ergin Xelîkan, Cengiz Acar, Osman Yılmaz, Nevzat Tunç, Hozan Cömert, Sîpan Xelat, Viyan û Erol Berxwedan derketin ser dîkê. Helbestvan Ömer Faruk Hatipoğlu jî di festîvalê de çih girt.

Di festîvalê de konek wek muze-yeke hatibû amadekirin û li wir cil û bergên Kurdên Anatoliya Navîn û dezgehên di jiyana çend sal berê de hatibûn bikar anîn, ji bo ziyaretvana hatibûn amede kirin. Li ser standên hatin amadekirin de pirtûk hatin firotin û ji bo piştgiriya Rojava jî kampanya alikariyê çebû.

Malbatên gerîla yê di şerê Kurdîstanê de şehîd bûn jî di festîvalê de amade bûn. Bi navê malbatan Ali Akgül di festivalê de xeber da. Bi navê Platforma Kurdên Anatoliya Navîn Semra Akçakoca, ji HDPê Arif Köse, parlamenterê HDPê yê Mêrdînê Gülseren Yıldırım gotinên xwe peşkeş kirin. Pîraniya wan li ser helbijartina serokkomariya Tirkîyê bûn û hat xwastin ku kurdên Anatoliya Navîn piştgiriya endamê HDPê Selahattin Demirtaş bikin.

Kurdên Aksarayê jî di roja 3.Tebaxê di 1. festîvala kultur û piştgiriya ya Ekeçikê da hatin bahev. Festîval bi amadekirina rexistina HDPê ya bajarê Aksarayê li

gundê Alayhanê hat çêkirin. Sê hezar kes bi çoşeka mezin beşdarî şenahîyê bûn. Parlamentera HDPê ya Mêrdînê Gülseren Yıldırım, ji navenda Partiyê Arif Köse, Ahmet Karataş, berpirsiyarên bajarê Aksarayê jî di festîvalê de amade bûn. Di beşa kulturî de jî İsmail Heval û Kemalê Amadê derketin ser dîke.

Di roja 18ê tebaxê da 2. Festîvala kulturê û Şenahiyên Havînê ya gundê Omê, bi sponsoriya menejerê Futbolê yê navdar Bayram Tutumlu hat çêkirin. Festîval bi organizekirina Kadir Demirci, Mustafa Güler û gundiyan re hat birevabirin. Organîzatoran li meydana gund xwarin dan beşdarwanan û paşê jî bernameya kulturî destpêkir.

Stranbejên wek Diyar, Ekin, Ergin Xelikan, Ümit Özmen, Nevzat Tunç, Koma Ronahî, Yaşar Bugurcî, Musa Berbang, Yusuf, Koma Sewko, Koma Serhad, Hozan Mişo, derketin ser dîke. Heta nivê şevê xortan govend girtin.

GIRÎNGÎYEK:

Numra kontoya me hatiye guhartin!

A nû ev a li jêr e:

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

MİRİNİYA HEVALÊ MÎN Î HÊJA, MEHME HEMÊ

Nuh Ateş

Lawê Hemê Hecî Elê û Fatê Husîn, mêrê Daymê Şêxî Bulduk, bavê Rêzan, Şîrîn û Ferhat, hemsal û hemgundiye min, Mehmê Hemê (Mehmet Özkan) ji ber derbeya xopana qanserê, li 26ê maha çiriya pêşin, li nexwaşxaneyê Berlînê (Almanya), seat li 1ê sibê çavên xwe girtin, ji ebediyê ra... ji nav me bar kir çû dinya wî alî û heval û hezkiriyên xwe di nav xemgînî û berxweketiyê da cihîştin.

Min nefes li Berlînê helna, çûm şîna hevalê xwe yê ezîz û qedîm. Ez çar rojan li wir mam. Bi heval û mermaliyên wî va, me meytê wî şande Xelikan. Seyfî Dogan jî, nivîskarê Bîrnebûnê, hemgundi û hevalê Mehmê ji Stokholmê hatibû. Di kombûn û merasimên şîna, xatirxwastin, bîranin û birêkirina meytê Mehmê Hemê da bi sedan mermalî, hemgundî, heval û nasên wî amede bûn. Sax be, heval û hemgundiye Mehmê Hemê, Hecosmanê Şemli di wan kombûn û merasîman da xwedîmali û rêvabiriyêke baş kir.

Mehmê Hemê li gundê Xelikan (Karacadag/Kulu/Konya) yê li nava Anatoliyê, sala 1950î hate dinyayê. Hetanî deh-diwanzdeh saliyê li gund, li ber destê dê û bavê xwe, li gor ra-

bûn û rûniştinên kurdan yê eşirtî û gunditiyê, bi çêrok û serpêhatiyên bi zimanê kurdi (kurmanci) mezin bû.

Mehmê Hemê mektewa seretayî li Xelika, ya navîn li Kuluyê û lîse li Konyayê teva kir. Ew sala 1970î sewa xwandina bilind hate Almaniyayê ba her sê birayên xwe yê li vir. Bi alikariya wan berê zimanê almanî hêvisî û paşê bi serê xwe û bi keda xwe dibistana bilind ya endazyarî (Mihendisî) a avahiyê teva kir. Di meslegê xwe da jîr û jêhatî bû. Xwediyê Şirketa Nûvakerîna Avahiyan bû û di vî kari da serketî bû. Fêdeya wî bi pir kesên ku di vî branjê da kar dikin bû.

Mehme Hemê merivekî kehîl, rûnerm, dilpak, çavferêh, xêrxwaz, fedekar, dinyadîtî, bi dost û heval bû. Mehmê Hemê merivekî welatparêz, tekoşerê doza kurdan bû. Hin di destpêka sala 1970î da di nav rexistina Şoreşgerên Kurd - HEVRA da cih girt û ji bo azadiya milletê kurd û welatê wî bi salan kar û xebat kir. Bi taybetî jî keda wî ya di salên 1970/80î ji bo damezrandina komeleyên karkiran Kurdistanî yê di bin bana KOMKARê da û di kar û xebatên wan da hêjayî behskirin û bîraninê ye. Fêdekariya wî bi hizbatî ne sinorkirî bû. Gava

ku wî dest ji siyaseta rexistinî ber da şûnda jî, ew weletparezekî hestiyar ma. Li Berlinê, wî alikariya rexistinên kurdan giştan û xebat û projeyên wan dikir. Mehme Hemê sponsor û xwendevanê kovara Kurdên Anatoliyê, BÎRNEBÛNê bû.

Memê Hemê hevalê min î ji berê berê da bû. Zarokti û xortaniya me li Xelikan bi hev ra derbas bû. Em bi hev ra çûn mektebê. Em li meheleyekê mezin bûn. Li baharan me bi hev ra berx çêrandin. Bi hev ra em çûn pîvanka, bi kaw, xotê (top) ço, veşêrkirin, zîl, kevrkî germo, zîl, golikî kîç û yên din liyistin. Havîn û payizan di nav karê zevî çininê û bêder (xerman) helnanê da alikar bûn. Di pey bêder helnanê va, em li şûna bêderan li ker yan hespên serberdayî sîwar dibûn û diketin pêşbirika lezgîniyê...

Dema xwendina lîseyê em li bajarê Konyayê li ba hev bûn. Pir serpehatiyên me bi hev ra hebûn. Yek ji wan ev bû: Em telebeye lîseyê bûn. Ji ber tengiyên civatî û sewa xwaşxeyal û dilxwaziyan em du xortên lêger û serheldêr bûn. Me kiribû serê xwe ku xwandinê cihbihîlin û li çareya jiyaneke serbest û serbixwe bigerin. Sewa qezenceke têr, qelawbûnê (zinginbûn) û xeyalên artistiyê Mehme Hemê û min me xwandina lîseyê di nivî da cihîst û xwe ji mermalî û hevalan vedizî û reviyar çûn Stem-

bûlê. Rev û çûyina me ya Stembulê berî tu tiştî negirt. Me tu pere qezenc nekirin û xwasteka me ya artistiyê jî neçû serî. Em qedera du mehan li Stembulê man û dûv ra şûn da vegeyriyan hatin ser xwandina xwe. Hingê me ji bo vê serheldana xortaniyê ji mermaliyên xwe û mezinên gund loma û azarên giran bihîstin.

Ez û Mehmê Hemê tevehev li meha Gulanê ya sala 2011an da çûne Kurdistanê Başûr ya azad û sê hefteyan li wir man. Di sayê vê gerê da em têr li ba hev man û me wexteke xwaş bi hev ra derbas kir. Me hevaltî û bîranînên xwe yên tozgirtî teze kirin. Me tim dixwast ku Kurdistanê azad bibînin û nas bikin. Dereng be jî bû nesîb. Ev çûyina me ya Kurdistanê Azad a yekem bû. Lewma em ê bi kelecana bûn. Ji Duhokê hetanî Helabceyê, em li pir deran gerîyan û me pir kes nas kirin û hen nasên xwe yên berê dîtîn. Gera me bi gîştî baş derbas bû. Em geh şa û qirikhelkişî û geh jî matmayî û bixem dibûn.

Mehmê Hemê Kurdistanê azad dît, ji destkevtî, avadani û serbestiya li wî beşê Kurdistanê tahm kir û pê şad û bextiyar bû. Li dawiya jîyana xwe ew bi êşa trajediya Şengal û Kobaniyê rûbirû bû û bû şahîdê serbilindiya bi berxwedan, mildanî û hevkarîyên hêzên kurd li Başûr û Rojavaya Kurdistanê jî. Di kurtedema berî rêwîtiya

Frankfurt	4:13	Yedigöller	4:10	London	6:34	Stockholm	6:13
Hamburg	2:52	Karın	3:25	Paris	10:18	Bahçe	5:17
Köln	5:23	Ermen	3:28	Madrid	10:28	Osaka	3:11
Münch	5:14	Silipol	4:11	Zürich	11:12	Amsterdam	10:16
Wiesbaden	4:11	Münch	2:10	Basel	4:14	Kopenhag	10:11

Genel Sıra
"İnsan, önemini her şeyle yitirdi yitir bırakmaz olur"
François De La Rochefoucauld

Tarihte Bugün
1918 : I. Dünya Savaşı sonrasında imzalanan Mondros Mütarekesi ile Kıbrıs'ta İngilizlerin yönetiminde birleşen ve Fransızın denetimine geçti.
1965 : Kuvâ-yi Milliye'nin kuruluşunun 100. yıldönümü.
1960 : İngiltere'nin ilk başbakanı bakanlık yaptı.

Dr. Dersim DÂĞDEVİREN SAĞLIK
Prödostrup nedir?

Bu hastalık (Prödostrup) kısıtlı, gırtlak bölgesindeki tiroid bezinin de size tahribatına ve buna bağlı olarak solunum yollarında ciddi bir nefes darlığına yol açabilen önemli kanserli olgularına anlamına gelmektedir. Prödostrup kısıtlı doğu zaman geçeleri günün ve tıpkı bir diğer (Hemir tıbbi) ile tanımlanır. Çocukları her nefes alıp verirken zıkkı çalar gibi veya tokar gibi sesler duyulmaktadır. Bu sesler solunum havamın akciğerlere girerken gırtlakta daralan ses şansı ile temas etmemesinden kaynaklanmaktadır. Çoğu zaman virüslerin sebep olduğu bu hastalıklarda gırtlakta özellikle ses telleri bölümleri, özellikle yumaklıdır. Solunum hava akciğerlere girerken ses tellerinin arasından geçmek zorundadır ve böyle bir durumda nefes almak büyük zorlanmaktadır. Bakımın el-patoloji ahlakı da daralan nefes yolları nedeniyle de zorlanmaktadır. Prödostrup genel olarak küçük çocuklarda

Mehmet Özkan yaşamını yitirdi

Yaklaşık 3 yıldan beri yaşamış kanser hastalığı ile mücadele eden İK Anadolu Kültüründen Mehmet Özkan, Almanya'nın başkenti Berlin'de yaşamını yitirdi. İmparatorluk ve İyveren Özkan'ın oğlu Mehmet'in de yaşamını yitirdi. İmparatorluk ve İyveren Özkan'ın oğlu Mehmet'in de yaşamını yitirdi. İmparatorluk ve İyveren Özkan'ın oğlu Mehmet'in de yaşamını yitirdi.



Bireylerin yaza sıra çok sayıda Kırdistan kurumu yöneticisi katıldı. Dostlar, Özkan'ın Kurt Özgürük Mücadelesi'ne yürekten



insanlık ve bu temelde yürüyenler için değerli bir kişilik taşıyan biriydi. YÖZÖZ POLİTİKA BERLİN

xwe ya ebedî da, ew bi bilindbûna pêla omdiya rizgarbûna miletê kurd û Kurdistanê hêsiya.

Gawa em ji gera li Kurdistana Başûr veşeriyar, me şor dabû hevdu, ku emê bi hev ra her sal herin serdana Kurdistanê û cih û warên din jî. Lê mixabîn nebû nesîb, tê da hatiya nexwaşiyê rê ne da ku ev daxwaza me here sêrî. Ez û ew herdem bi rêya telefonê di nav têkiliyê da bûn. Wî jî min ra derheqê nexwaşiya xwe da rastî ne digot û nedixwast ku ez bihêman serdana wî. Min hetanî miriniya wî jî sedî sed nedizanî ku nexwaşiya wî qanser e.

Min pir dixwast herim serdana wî. Lê her car wî bi bahaneyêkê peşî li min dibirî. Tim dikete bîra mîn. Rojekî di ber miriniya wî, êvara şemiyê min jî mala wî ra telefon kir. Xaniyama wî Daymê hate ser telefonê û got: "Çend seatan berî vê, me Mehmê bire nexwaşxaneyê, tozikê şekirê wî

helkişiyê, ewê sibê bê mal, eza jê ra bibêman, ewê li te bigere. Dora dine rojê xebera miriniya wî hat."

Miriniya zû û jî ber xopana nexwaşiyê li merîva bi qahr tê, meriv pê dişe. Lê mirinî ferzeke jiyane ye, pêwîstiyêke gerduwî û xwezayî ye. Ew rûyê jiyane yê sar û tarî ye. Meriv dikane mirinîyê mîna şûn û rûguherineke ebedî, xatirxwastineke dawî û rêwîtiyêke bêveger bi nav bike.

Heyfa Mehmê Hemê!
Oxir be merê çê, hevalê hêja!
Tê bi heslet û taybetmendiyên xwe yên kubar, insanî û kurdewarî her dem di bîra min û hezkirên xwe da bijiyî!
Cih û ware te buhişt û ruhê te şad be!
Serê malbat, heval û hezkirên Mehmê Hemê sax be!

Mainz (Almanya), 02.11.2014

El-Malikî "Dergevanê agir" û çêkirê "leylanê!"

Dr. Sozdar Mîdî

Wergerandin ji erebî: Mihemed Hesko (Birasoz)

Pendek e romanî ya kevin heye dibêj e: Koşkar nikare xwe di ser solê re bigrê! Herusa kesên faşîzim jî, nikarin xwe di ser hizir û têgehên xwe yê faşîzîmî re bigrin û nikarin ji nîrînên xwe yê dagîrkerî yê paşmayî rizgar bin û bi taybet eger mijar bi kurdan ve girêdayî be.

Û di rastî yê de, ku pirsgirêk a gelê kurd digel vê cûrê faşîzîmê pirsgirêkek e gelek aloz û dijwar e. Ji ber ku ew nikarin û dibe naxwezîn, têbîghêjin ku em milletek in, milletekî serbixwe ne û ne fers an ereb û ne jî tirk in. Mafê me kamil heye ku em kurd di dewleta xwe ya serbixwe de bi azadî bijîn, weku hemû gelên cîhanê. Û ya balkêş û matmayî ew e ku, sêrî me kurdan dikin weku em xortên xwîn germ in û serê me jî germ e û em nizanin em çi dixwazin û herusa çi dikin, û her û her pêwîstiya me bi tembî û şîretên wan he ye, û eger em guh nedîn şîret û tembîyên wan, em ê têkevin leylanên bê ser û ber û bê dawî.

Û koşkarê herî dawîyê jî, ku bi dayîna şîretên xwe yê giranbûha û camêriya xwe li me kir, ew jî Nûrî El-Malikî, serokwezîrê Iraqê ye. Û

wêha diyare di kelepura îslamî de jî, ku dergevanê dojhê navê wî Malik e û rola ku Nûrî El-Malikî pê radibe ji dema ku bûye serokwezîr ev e; ku îraq kire dojh, û rijde ku her bimîne dergevan ji dewleta xwe ya dojhî re û ret dike ku ji ser kursiya xwe ya xwedawendî bê xwar.

El-Malikî "dergevanê agir" ev jî ligor derbirîna îslamê, rabû û rûnişt û bû (firt û zirta) wî, û ji bilindiya xwe ve, bi şîret û bi gef xwerinê bi ser kurdan de vebû, çima? Ev yekî jî, ji ber ku Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê ragihand ku dema gelê kurd hatîye da ku bibe serbixwe. Û şîreta ku hişmend û jêhatîya "dergevanê agir" ku pê camêriya xwe li kurdan kir, çi bû? Ew jî agahdarkirina kurdan bû, ku dê bikevin leylanekê û ewê jê dernekevin!

Ev şîreta Malikî ya bi gefgir, gelek wateyan di bin xwe de vedîşere:

Yek ji wan wateyan ew e; ku ew û kî li paş wê gefê ye û di pêşiyê de faris û hevalbendên wan, dê çoyan têxin nav tekerên pêvajoya serxwebûna kurdan. Û ewê nîfşekî nû ji caşên kurdan çêkin, ew jî bi rêya silogan û felsefeyên caşîtiya nû, û dê kurdan bi

kurdan bikutin û bi dest hev, hevdu wêranbikin, û mixabin rih û rîçalên caşîtiyê jî hen e, û li benda dilovaniya dagîrkeran e da ku jî nûve serî hilde û şîn bibe.

Û her jî wan wateyan ew e ku, dê peyayên xwe yên cîhadî(xwekuj) jî her du mezheban, sunnî û şîî bi ser kurdan de bişînin, digel vê yekê fetwêyên Elî El-Sîstanî lêvegerê mazîne şîîyan jî hazir û amaden e. Beriya demeke nêzik giropên cîhadiyên şe bi ser erebên sunne de berdan, çîye wî nehêl e ku giropên xwe yên cîhadî bi ser kurdan de jî ne berd e? Û ne veşartîye ku Elî El-Sîstanî û Nûrî El-Malikî herdu şûnkarên farisan in li Îraqê.

Yê yekem erka wî ya olî ye. Ew jî berkirina fetweyan e.

Yê duyem erkê wî sîyasî û leşkerî ye, ew jî vegerandina serhildêra ne bo mala çokdanîna farsî ye.

Herusa jî wan wateyan, ku Nûrî El-Malikî "dergevanê agir" dê şer li dijî herêma kurdî (Kurdistanê) rabîghîne. Û bi behaneyê şerkirin li dijî terorîstan hêzên xwe bi balefir û bi mûşekan biçek dike, û çîye bihêle ku ew berê belafir û mûşekên xwe berve Herêma Kurdistanê neke. Û bîngeha bîngehîna ku ev çend sal in kurdan di avakirina wê de westiyân

e û bi bizav û lêçûneke pareyên pir avakirin e, wêran bike? Ma ne bîngeha zêrîna faşîstan ew e: "*Ez nikarim xwe bi gihînim asta te, ma ez ê te neghînim asta xwe!*"

Erê, çî tişt rêgîriyê li Nûrî El-Malikî "dergevanê agir" neke û bi piştevaniya hevalbendê farisî ku berê balefir û mûşekên xwe berve deverên Kurdistanê bike, ew jî bi bihaneya serkutkirina "serhildêrên cudaxwaz" jî dewleta Îraqê ye, weku çawa Sedam Husên dikir û herusa hêzên bê sênc û tolazên mezin ê cîhanê jî, yên ku hikumê cîhanê dikin, dê bê deng bin, jî ber ku hemû li dijî parçebûna dewleta Îraqê ne!

Bila kurd û Kurdistan jî herin bikevin dojeheke herî nêzik, ew jî dojeha "dergevanê agir", Nûrî El-Malikî ye.

Kurdino! Divê win bizanbin ku gefên "dergevanê agir" jî dil in, jî ber ku ew zîlam (Ne jî xweberê diaxife, lê belê îlham û wehî ye), "soreta El-Necim ji Quran" ê û Elî Xamîneyî rêberê bilîndê farisî û bi rêya şûnkarê xwe Elî El-Sîstanî re, ew e; yê ku Wehî bo wî daketiye û ew û hevalbendên wî, çêkirê leylana bê dawî ne.

Gelo, win jê re amade ne?!

Û çî dibe bila bibe, divê Kurdistan rizgar bibe!

1-8-2014

“Mîrê Kurdistanê”

KAKELO

Serpêhatiya Super-Sextekarekî

Rohat Alakom

Di nivê pêşîn yê sedsala 20an de mijarên wek balerîn û hunermend Leyla Bedirxan û Zaro Axayê Bitlisî ku li cîhanê mirovê herî kal hatibû nasîn gelek navdar bûne. Belkî jî Kakelo serpêhatiya Zaro Axa ya balkêş fêr bûye û daye li pey rêça wî. Lê belê çavkaniyên kurdî yên kevn qet qala vî terzîyê super-sextekar nekirine, di van çavkaniyan de navê wî jî qet derbas nabe. Ev yeka ji bo mijara Leyla Bedirxan û Zaro Axa jî derbas dibe. Wek tê zanîn ev salan li Kurdistanê salên serhildanan tên hesabîn. Zilm û zordestiya li dijî kurdan mezin e. Ji ber van rastiyan mimkûn e van mijaran bala kurdan zêde nekiraniye.

Berî 20 salan di çapemeniya swêdî de ez rastî nûçeyeke bi wêne bi sernivîsa “*Welîhatekî Sextekar*” (En falsk kronprins) gelek kurt hatim. Bi rastî jî min zêde jî giringîyek nedayê. Lê belê dîsa jî min kopîyake wê nûçeya kurt derxist û kire nav arşîva xwe. Di vê nûçeyê de dihate gotin ku “*Ev demekê dirêj e mirovek li Berlînê dijî û dibêje ew kurê herî mezin yê mîrê Kurdistanê ye. Niha eşkera bûye ku ew terzîyekî misirî ye û ji bo gelek tawanan berê hatiye ceza kirin û ji Elmanyayê jî hatiye dersînor kirin, qewitandin*”.¹ Di sala 2006an de min ev nûçeya kire mijara nivîseke kurt di malperên kurdî de belav kir.² Piştî vê nivîsa min çend sal derbas bûn. Paşê ez fêr bûm ku nivîskareke finî li ser vîkesê sextekar wek em ê li jêr jî bibînin şanoyek nivîsîye, sextekariya wî derxistiye holê û jîyana vî kesî wek pirtûk weşandiye. Ne tenê li Swêd, Finlandîya û Almanyaya, ev kesê sextekar li hemû cîhanê hatiye nasîn. Kakelo polîsên Fransayê, Îngiltere û Amerikayê jî bi qasî deh salan mijûl kiriye, li pey xwe gerandiye. Di sala 1922an de li Parîsê tê girtin.³ Paşê diçe Almanyayê û Îngiltereyê, ji wan welatan jî tê dersînor kirin. Navê wî di dîroka Îngilterê ya krîmînal jî de derbas dibe. Mirovekî tarî bûye û bi karên qulopilo mijûl bûye.⁴ Vî terzîyê misirî

1 En falsk kronprins, *Vecko Journalen*, nr 32/1925, rûp.14.

2 Rohat Alakom, Nûçeya salê-Sextekarê mezin “Kurê Mîrê Kurdistanê!” eşkere bû (Malpera Nefel, 25/12 2006).

3 Kakelo arrested in Paris, *New York Times*, 26/12 1922.

4 Nutleys Lucas, *London and its criminals*, 1926, rûp.107.

navnîşana xwe kiriye mîr (prince) û ji ber vê jî her “Mîrê Kurdistanê” xwe daye nasîn. Lê belê ji bo ku xwe nede dest gelek caran navên nû li xwe kirine, wek *Seîd Mihemmed Kakelo*, *Said Mihemmed Zerdeşeno* û *Seîd Xelil Zerdeşeno*. Di çavkaniyan de zêdetir forma Mîr Zerdeşeno (Prince Zerdecheno) bi cîh girtiye. Bona ku ku bal û hişê xwendevanan zêde tevlihev nekim min li jêr tenê forma *Kakelo* bi kar anîye.



Kovareke swêdi ku cara yekem sextekariya Kakelo derdixe holê
(*Vecko Journalen*, nr 32/1925)

EN FALSK KRONPRINS.

Dema qala “Mîrê Kurdistanê” tê kirin bêguman mafê xwendevanan heye ku di diroka kurd de li pey rêça wî bikevin û xwe bighînin agahî û zanyarîke kêrdar. Lê belê kesên ku vê rêyê hildijibêrin pir mixabin nafîle û badihewa hewl didin. Bona ku bi vî navî mîrek di diroka kurd de tune ye! Di rewşeke wiha de destpê li mirovan tên girêdan, mirov neçar û bêgav dimîne, nizane çi bike. Ji bo ku serpêhatiya Kakelo di çapemeniya ewropî de baş hatiye dokumente kirin, em jî divê berê xwe bidin van çavkaniyan. Dema mirov li çavên Kakelo û wan hersê kesên din ku bi şikberî li wî dinêrin mêze dike, wê demê mirov fam dike ku li vir tiştêkî nenormal diqewime!



Kakelo li Amerîkayê ji otelekê derdikeve.

Hin xwendevan û nivîskarên kurd bi rêya organên medya sosyal (facebook) serpêhatiya Kakelo gelek meraq kirine, bi pirsên “*Kakelo kî ye?*” û “*Mîr Zerdeşeno kî ye?*” alîkarî xwestine. Di înternetê de çend wêneyên Kakelo ligel hin perçerajnameyên wan salan hatine weşandin. Hin xwendevanan ev kesa wek mîrekî kurd dîtine, li pey gotina *Zerdeşeno* ketine û dîyar kirine ev gotin di zaravayê soranî de tê wateya “bişîrîn”. Hin kesên dîyar kiriye ku wan gelek hewl dane lê belê di derbara wî de zêde agahî peyda nekirine. Wek mînak yek ji van kesên meraqdar nivîskar Halil Îbrahim Baran di malpera xwe ya înternetê de dibêje ku wî wêneyekî Kakelo li Amerîkayê di Pirtûkxaneya Kongreyê de peyda kiriye û di

derbarê Kakelo de rastî tu agahiyê nehatiye.¹ Tiştêkî balkêş jî di binê van nivîsan de hin xwendevanan dîtînen xwe wek şirove pêşkêş kirine. Wek mînak yekî gotiye: “*Kêf kêfa Kakelo ye*” û yekî din wiha gotiye: “*Zerdeşeno hinekî dişa hewl bida dikaribû biba Çarlı Çaplînê kurdan*”. Bi rastî tîpa Kakelo gelek şibandiye Çarlı Çaplîn û serpêhatiya Kakelo tam jî mijara film û şanoyan bûye. Çawa em ê li jêr jî bibînin nivîskara finî Maria Jotuni hê berî 80 salan ev yeka keşf kiriye. Belkî jî bi zanetî di şanoya xwe de navê Charles li Kakelo kiriye. Wek tê zanîn navê Çarlı Çaplîn ê rastîn *Charles Spencer Chaplin* e.

Paşê derketiye holê ku navê vî sextekarî Seid Mohammed Kakelo ye. Wek mînak Kakelo bi navê “Zerdecheno Mohammed Said Kakelo” di sala 1923an de li Îngilterê jîyaye, bi rojan di otelên bi navên Savoy Hotel û Hyde Park Hotelê de maye, xwariye, vexwariye û kêfa xwe kiriye û mesrefên otelân nedaye, ji ortê winda bûye. Dema Kakelo li hemû Ewrûpayê tê nasîn, starek jê re namîne, di dawiyê de berê xwe dide Amerîkayê.



Kakelo li Amerîkayê

Gera wî ya li Amerîkayê gelek rengîn derbas bûye, di hin wêneyan de em wî bi jin û keçên cîwan re dibînin. Kakelo li Amerîkayê bi keçeke Catherine (Miss Kitty Spigli) re dizewice.² Di rojnameyekê de navê xwe kiriye “Zerdecheno

1 <http://ibrahimhalilbaran.tumblr.com/post/40435336390/kurdistan-emirlerinden-prens-said-zerdeceno>

2 *Kentucky Girl Gives Up 'Royal Husband'..*, Evening Telegram, 4/9 1921.

Mohammed Said” û gotiye ku ew biraziyê Mistefa Kemal Atatürk e.¹ Dema em fêr dibin ku Kakelo gotiye qesreke bavê wî li Kurdistanê heye ku ji 1000 çav û odeyan pêk tê. Wek Çîrokên hezar û yek şevan. Êdî em dibînin ku Kakeko devê dûrikê vir-derewan li Amerîkayê heta dawiyê vekiriye.² Di cîhekî din de wî gotiye ku wek Mîrê Kurdistanê ew qasî 18 mîlyon kurdan temsîl dike. Çawa xuya dibe Kakelo êdî xwe mîna “bavê kurdan” ditiye.. Wek mînak Kakelo di cîhekî de gotiye ku ew ê here alîkariya apê xwe bike ku pêşengiya ordîyên li hemberî tirkên dike.³ Çawa tê zanîn di vê salê de Serhildana Şêx Seîd li Tirkîyê dest pê kiriye. Wî bi saya van navnîşanan bala gelek mirovan kişandiye û ketiye nav koma sosyeteya amerîkayî jî. Wek mînak dema Siltana Afganîstanê hatiye Amerîkayê, Kakelo bi koma wê re dostanî û hevaltî daniye û tevî komê bûye.

Di dawiyê de balona dewremana a Kakelo diteqe, her tiştê wî derdikeve holê. Rojnameyê Amerîkayê di sala 1925an de dîyar dike ku niha berpirsên Amerîkayê dixwazin vî sextekarî dersînor bikin, lê belê ne Îngîltere û ne jî Fransayê ew qebûl kiriye. Rojnameyê paşê wiha gotiye: “*Mîr divê di Okyanusekê de bijî-Tu kes wi naxwaze*”. Rojname jî bo sextekariya wî dibêje ku “*Cambazekî xîretkar bûye*” û ji xwe re gelek navnîşan îcat kirine wek “The Emir of Kurdistan” û “Prince of Egypt”.⁴

Çawa xuya dibe mijara Kakelo ji salên 1922 salên 1932 li cîhanê her belav bûye. Kakelo wisa navdar bûye ku ji nivîskar û lêkolanan re kar derxistiye. Serpêhatî û çîroka vî kesê misirî yê bi navê Kakelo bûye mijara berhemeke edebî jî. Nivîskara finî ya jinîn Maria Jotuni (1880-1943) di berhemeke xwe de cîh dide jîyana vî kesê sextekar û bi navê “Mîrê kurd” (Kurdirin Prinsî) şanoyekê di sala 1932an de dinivîse.⁵ Maria Jotuni, bi nivîsandina berhema “Mîrê kurd” serpêhatiya Kakelo kiriye perçeyekî edebîyat û şanogeriya finî. Ev berhema ku ji 254 rûpelan pêkhatî wek şano çend caran li Finlandayê hatiye lîstin jî.⁶

Naveroka vê şanoyê balkêş e. Kakelo rojekê di rojnameyekê de dixwîne ku kesekî terzî çawa ketiye dilqê (rol) mîran û welat welat geriyaye, mirov xapandine. Kêfa wî gelek jî vê nûçeyê tê û ew jî biryarê xwe dide ku bikeve dilqê mîrekî kurd û derkeve tura dinyayê, şansê xwe biceribîne. Wî di şanoyê

1 “Egyptian” Crown heir Fades Away”, *The Batavia Times*, 2/12 1922.

2 “Egyptian” Crown heir Fades Away”, *The Batavia Times*, 2/12 1922.

3 Ji notên paş wêneyekî Kakelo.

4 Emir Must Live On Ocean -Nobody Wants Him, *Lockport Union-Sun & Journal*, 20 April 1925.

5 Maria Jotuni, *Kurdin Prinsî*, 1932.

6 Gelek spas jî bo Peppinayê (Xanima Fli Çiçî, xweyê Weşanxaneya Apecê) ku ev pirûka bi zimanê finî xwend û di derbarê naveroka wê de kurtenivîsekc swêdî jî bo me amade kir.

de navê xwe yê rastîn Kakelo veşartîye û navê Charles li xwe kiriye. Amî û jina xwe Hildur ku ji malbateke aristokratên Fînlândiyayê ye hêviya hatina mêvanên xwe ne ku wê ji Amerîkayê bîn. Mêvanên wan xwişka Hildurê, Emma û kurê wê Charles e. Emma berî bîst salan çûye Amerîkayê li wir cîwar bûye. Lê belê tiştine balkêş dîsa di şanoyê de rûdidin, diqewimin. Kesên ku

Emir Must Live On Ocean— Nobody Wants Him.

BY LARRY BOARDMAN
NEA Service Writer

Washington, April 22.—His Highness Seld Zerdecheno, "Prince of Egypt" and "Emir of Kurdistan," seems due for a life on the ocean waves and a home on the rolling deep—with the White Star steamship line footing the bill.

Ordered deported from America, his various other countries won't let him in.

He can't stay here—and he can't go anywhere else!

All of which is causing U. S. immigration authorities no concern at all, and neither does it appear to bother his highness.


But according to George C. Tolman, assistant commissioner general of immigration it is something for the White Star line to worry about.

"They brought him here," said Tolman, "and they've got to take him away."

"We don't care what they do with him—but they'll have to keep on paying his expenses until they do it."

Deported to England.

The prince, emir or something



The EMIR OF KURDISTAN,
or "PRINCE OF EGYPT"

District of Columbia jail
Immigration authorities made the arrest at the Egyptian legation, where they found him further pressing his claim.

"He was a clever faker," said Tolman, "living off his t-manu-

Ji rojnameyêke amerîkî
(Lockport Union-Sun & Journal, 20 April 1925)

navên wan di şanoyê de derbas dibin, ketine dilqên cûrbecûr. Kî kur/keça kê ye kes pê nizane! Wek mînak xuya dibe ku bavê Charles xweyê malê Amî ye. Amî berî salan bi Emmayê re maye û jê zarokek bûye, ew zarok niha mezin bûye, navê Charles li xwe kiriye. Amî ji aliyê jinan de gelek qels bûye wek kesekî jinbaz tê nasandin. Nivîskar Maria Jotuni bi alîkariya van bûyeran xwestîye serpêhatiya Kakelo ku xwe wek mîrekî kurd daye nasîn nêzî hev bike û dinya mirovan a hundirîn eşkere bike. Dema Charles hatiye Fînlândiyayê jineke Çînî jî bi xwe re aniye, navê wê Lilang e. Malbata wê li Amerîkayê karê terzîtiyê dike û Charles jî li wir ketiye ser kar.

Dema Charles li Fînlândiyayê dimîne, vê carê ew çav berdide berdestiya malê ku xizmetan dike. Kurekî malê jî dilê xwe dixwe wê keçîka çînî ku Charles bi xwe re aniye Fînlândiyayê. Nivîskar xuya dike ku têkiliyên di navbera mirovan de çawa dikevin zikê hev û wan ji rê derdixin. Charles (Kakelo) di cîhekî gotiye ku "Em di dewra pêşketinê de dijîn. Ez plan dikim ku welatê xwe angorî Ewropayê pêsta bibim. Jin wê serê xwe vekin, mêr wê rûdanên xwe yên dirêj bibirin, jêkin. Mirov li şuna bikaranîna hêstiran (devan) wê li keştiyên ezmanî şiyar bibin". Dema Emma hatiye Fînlândiyayê ji Charles re gotiye qet

besa “Kurdûna xwe” neke. Lê belê di dawiya şanoyê de kesnameya rastîn a Charles derdikeve holê. Dema carekê Amî rojnameyekê dixwîne, ew li wir rastî nûçeyekê tê ku qala mîrekî kurd dike ku li hemû Ewropayê bi sextekariya xwe hatiye nasîn! Dema mîr vê yekê dibihîse dikeve rewşeke gelek xirab. Piştî vê yekê êdî “Mîrê Kurd” Charles mecbûr dimîne navê xwe eşkere dike: *Seid Mohammed Kakelo*.¹ Paşê çî hatiye serê wî, kes pê nizane û piştî sala 1932an êdî em şopa Kakelo di çavkaniyên nivîskî de wînda dikin.



Maria Jotuni û bergê pirtûka wê ya bi navê “Mîrê Kurd” di derbarê Kakelo de

Ez bawer dikim ku em bi alîkariya hin gotinên pêşiyên serpêhatiya Kakelo baştir dikarin bidin nasandin: “*Kesekî ku derewekê bike dikare deh derewan jî bike!*” Kakelo çûye kîjan welatî, kîjan dîyarî navê xwe guhartiye û ketiye dilqekî din. Bi kurtî wî jîyana xwe li ser vir-derewan însa û boyax kiriye. Rolên xwe gelek baş listiye. Lê belê pêşiyên me dîsa rast gotine: “*Derew rojekê derdikevîn rûyê tavê!*” yan jî “*Mûmê derewkaran beta derengiya şevê vêdikeve!*”

¹ Maria Jotuni, *Kurdin Prinssi*, 1932, rûp.202.

Helbest

dema ku tirîjên rojê teze axa min dixamilandin
bayekî germ li ser lêwên min dihilist
û dengî pêlên behrên dûr wek orkestrakê hundirê min zîz dikirin
va stêrka dûna me ye
ezî axê, avê hewayê bi mêşhingiv, kurm û kêz
çuçikên hewa û li ser erdê va parva dikime
asîmanê hêşinê canê min zindî dike û difirîne
pîrsên bê bersivên ku tema xwe wek axûyê marî kor
mêjo û dilî min mijûl dikine û dieşînine
ezî ji bîrên kur avên teze û zelal vedixwime
û avên qilêrî û şilopî bi pênc hisên xwe diparzûnîme
tu rîyê min ê bêguman tunen
her rîyêk mektebek e
çavên min ê tu serdaran û rêzanan nebînin
çîmkî ew, bêndên li ber heqîqet in
ez giranîyê rojan dizanim
ez dizanim sereşîyê jîyanê û bêdilsozîya însana

Seyfi Doğan

ŞOPÊN DEMA XATÎRXWAZTÎNÊ - VI-

Nuhê Hecî Malê Herşîd

Ziman deriya li ber meriva vedike!

Simo hefteki li bajarê W. li ba birayê xwe Hesên ma. Di çaryeka dawî ya sala 1970î da, roja yekşemiyê ew ê bi Tîranê berbi bajarê Îserlohnê bi rê ket. Birayê wî, Hesên ew li wî bajarî li kursa ziman ya Enstîtûya Goethe qedid kiribû. Evara şemiyê, hemgundiyên wî sewa oxira xêrê hatibûn serdana wî, li mala birayê wî kombûbûn. Mévan hetanî derengiya şevê li ba wan rûniştin. Paşê, ew belav bûn û Simo xatirê xwe ji wan xwast. Wana jî çûyîna wî ya bajarê Îserlohnê xêr kirin û li gor edet û rismên gundê xwe xercirê kirin beriya wî.

Danê sibê, Simo bi birayê xwe va ji mal derketin û peya berve Garajê Tîranê bi rê ketin. Bedêngiya rojên yekşemiyê, sari û tariyê dagirtibû ser bajêr. Baraneke hûrik dipîşkand. Bi hewa û heyamê veng Simo tamsar dibû. Ji ber sermayê wî xwe nure serhev kiribû. „Va heyamî veng î neçê çî ye, hefteyeke ku ez li vir im, me hîn ro nedîtîye. Ku roj derdikeve jî, pir najo, hema ewrê peşiyê li wê digrine“, Simo di ber xwe da got. „Va dera jî weng e! Tişt nabe, tu ê

hu bibî. Di sêrî da, bi me jî weng dihat, paşê em hu bûnî“ birayê wî lê vegerand.

Bi rê da, Hesên şîret li Simo kirin: „Simo, çar sal in ku ez li welatê Almaniyayê me. Tecrubeyên min hene. Rind guh bi ser şîretên min de. Xîret bike, bi lez zimanê almanî bihêvisê. Ziman anehera (mifte) derîya ye. Her zimanek pencerekê ji bo naskirina alemekê nû vedike li ber merivan. Ji bo xwandîna li zaningehê jî hêvisîna almanî ferz e. Ji bo serketina di her cîhetê da, hevisîna almanî şerda peşî ye!...“ Simo bi dîqet guh diha ser gotinên birayê xwe û bi serî hejandinê gotinên wî tesdîq dikirin.

Her du bira zû gihêştin Garajê Tîranê, hîn êpî wext ji hatina Tîranê ra hebû. Ew li ser qenepeyekê rûniştin. Hesên dîsa dest pê şîretan kir. Ji ber ku dizanî Simo bi fedî ye û li nav civatan pir deng nake, got: „Fedî neke, ma tu î hewesdar û hewldar bî. Ji xwandîna bêtir tu şansa te tune, bixwîne û bibe xwediyê marifet û zenetekî. Bêî van heyat zor e!...“ Di rastiyê da, her çiqas Simo li

gor şiretkirina malbatî li civata mezinan bêdeng dima be jî, li nav heval û hemsaliyên xwe biziman û xwaşsohbet bû.

Di wê navberê da, pirsra rêwiyekî yê ku ji hêla Simo da nêzikî wan bûbû, sohbeta wan birrî. „ma hun Tirk in?“ wî ji wan bi tirkî pirs kir. Simo bi lez, beî ku bersiva xwe di serê xwe ra derbas bike, got, „na, em ne Tirk in!“ Li Tirkîyê, wî pir cara bi taybetî li cihên ku Tirk lê yan li cihên resmî xwe Tirk dihesiband û wer dida naskirin. „Lê hun ê bi tirkî deng dikine“, rêwiyê Tirk bi miruzekî tahlkirî li Simo vegeand. Heta hîngê, birayê Simo, Hesen xwe avête navberê û berê xwe berve rêwiyê tirk kir û bi tirkî got, „hemşehriyê min, ma ew bibê, guh mede wî „em Tirk in“. Rêwiyê tirk zû rûye xwe guherî û ji wir bi dûr ket. Hesen li Simo vegeerî û bi dengekî azarbar got. „Çima tu wer dikî! Tirkê esil em in. Gotinên veng meke, pê serî xwe û î me jî meke tu beleyan!“ Simo serî kirî ber xwe û bêdeng ma. Dilê wî pir dixwast ku bersiva birayê xwe bi-daya û bigota, „madem tirkê esil em in, çima zimanê me ne yek e, çima em pir cara di nav xwe da dibên em kurmanc in û li ba tirkan dibên em tirk in û çima...“ Lê bi şîya nekir, newêrî ku bigota. Ev gotin û pir-

şevokan di serê wî da li dûv hevdu rêz dibûn û hewl didan ku ji devî wî derbikevin, lê nedihatî ser zimanê wî, te ê bigota gewriya wî xetimiye, hatiye bendkirin. Ji ber ku ew î neçar bû, mihtace birayê xwe bû, li destê wî mêz dikir.

Pêçek neçû, Hesen û Simo bi dengê fitîkîna Tîranê yê ku li meydana Garêj mîna hîşmara hazîriya rêwîti û xatirxwastinê belav dibû, rabûn ser pîyan. Bi hîsên firqetiyê wan dest di stûyê hev ra birin û ji hevdu xatirxwastin. Her duyan jî çav tijî kirin. Simo li Tîranê sîwar bû û Tîran bi fitîkinê berve Îserlohnê bi rê ket. Dengê fitîkîna Tîranê edî di serê Simo da mîna nişana xatirxwastin û firqetiyê cihê xwe girtibû.

Danê êvarê, Simo gihêşt bajarê Îserlohnê. Îserlohn bajarokekî bi qasî çel hezar nefer, bi banên bilind û nawalên kûr û bi dar û be-ran xemilandî bû. Ji hêla madenên va, şûnwarekî bi ber bû. Bi derzî, telê mesingî, tunc û qutiyên titunê navdar bû. Simo li Enstîtûya Goethê ya li wî bajarî destpê hêvisîna zimanê almanî kir. Ew di xaniyê ku Enstîtûyê kirêkirî da bi telebeyekî brazîlî va tevhev dima. Êvara roja ku ew hatibû mala xwe û bawilê xwe betal kir, dît ku di binê bawil da dîya wî beî ku wî hay jê hebe xela spîbelek

di binê bawil da bi şûn kiriye. Simo pê him şa û him jî zîz bû. Pê kete nav xem û xeyalan û çû diyarê bav û kalan. Dayika wî, hunerkara xela spîbelek hate ber çavan wî. Wî xebe di dîwarê odeya xwe da kir.

Ji bo hêvisîna almanî, Simo xwe baş amede û motive kiribû. Bi xîreteke mezin xwe dida ser dersan. Tekstê her dersekê kêmîtir pênc cara geh bêdeng û geh jî bi dengêkî bilind dixwand û evqas car jî dinivîsand. Peyvên ku bilêvkirina wan bi zehmet bû û bi taybetî yên dirêj û hevedudanî hîn pir dinivîsandin û bi dengêkî bilind dubare dikirin. Wî hewl dida tiştên ku wî li dersxaneyê dihêvisî, li derva, bi nas û hevalan va bi kar bîne. Li mal pir guh dida ser radyoyê. Helbestên gelerî yên sade û bi kefiye ezber dikirin û bi dengêkî bilind dixwandin. Çend rêzên helbesteke ku wî ezber kiribû weha bûn:

Es war einmal ein Mann
Carek ji caran hebû merivek
Der hatte einen Schwamm.

Wî hebû sungerek
Der Schwamm war ihm zu naß,
Bi wî pir şil hat sunger
Da ging er auf die Gass'.
Dev da sûkê, çû der
Die Gass' war ihm zu kalt,
Sûk jê ra sar hat, bû saristan
Da ging er in den Wald.

Lewma wî lêxist çû daristan
Der Wald war ihm zu grün,
Daristan bi wî hat hêşin
Da ging er nach Berlin.
Lewma wî berê xwe da Berlin...

Ji bo hînbûna zimanê almanî, Simo ji tecrubeyên di zarokatiya xwe da jî fêde didît. Di zaroktiya xwe da, wî tenê kurdiya kurmancî dizanî. Di dibistana seretayî da ew hînî zimanê tirkî ango zimanekî yad bû. Bi wekhevî û nezikîheviya hen peyv û dengên kurdî û almanî jî di proseya hînbûna almanî da Simo çavbîr dibû. Çend nîmûne: Birin= bringen, brader=bruder, hebûn=haben, honig=hengiv, kanîn=können, nû=neu, nav=name, (hê)stêr=stern, kurt=kurz, hesin=eisen, erd=erde, teng=eng, germ=warm.

Peyva almanî ya ku di sêri da xwaş dihate guhê wî „sowieso“ (bêgûman) bû. Peyvên ku bi wî neçê dihatin „verbot(en)“ (qedexe) û „katastrophe“ (bêtar) bûn.

Xurdeya „Am“ (bi kurdî: li) jî di destpêkê da, ji ber meneya wê ya bi tirkî (vagîna) bi wî neçê hat. Di zimanê almanî da „am“ pir tê bi kar anîn: „Am Montag“ (li duşemiyê), „Am Dorfplatz“ (li meydana gund), „Am besten“ (çêtir/çêtirtir) ... Ev xurdeka carna, di hen dersan deh

cara ji devê mamosta ya jin gava ku wê teksta dersê bi dengêkî bilind û giran giran dixwend derdiket. Mamoste jîneke navzirav, çepildirêj, porkej û bi devûrûyên şîrîn û lihevhatî bû. Di hen dersan da belkû deh cara „am „ ji devê wê derdiket û evqas car jî ji devê telebeyan yên ku darsa wê rojê li gor xwastina mamosta dubara dikirin. Eva bi telebeyên tirkîzan, bi taybetî yên dîndar bi bed dihat. Telebekî tirk ê ji Kayseriyê, gava ku ev xurdeka ji devê mamoste dibihîst, pê surpundir dibû.

Di hundirê çar mahan da, Simo li Enstîtûya Goethe çend ferdên ji mîlet û welatên din ên alman, brazîlî, portekîzî, tirk, çekî, kurd nas kirin û bi henan va jî hevaltî kir, bi taybetî bi Jose va, yê brazîl va. Ew bi Jose va di odeyekê da diman. Nas û hevalên Simo didan xuyakirin ku ew ê ji sohbeta wî ya bi almaniyeke bi kêmanî û bi alikariya dest û piyan û ji dengê wî yê kûr hez dikine. Li ba wan Simo xwe bi nasnameya kurd dida nasandin. Simbêlên wî jî yê pan û gir ên ku li ba peyrew û yaneyên nêrînên çep û şoreşger hezkirî û li ba sofyiên ezdî, rêya heq, yarasanî kutsî bûn bala meriva dikişandin.

Kesên ku Simo nas kiribûn, yan jî ji nêzik da didîtin bi hen taybetiyên xwe, bi sîma û tevge-

ra xwe bi wî nas dihatin. Evqas nas dihatin, tê bigota wî ew ê berê dîtine. Ji mêyla nasbertiyê da Simo pir jêhatî bû. Di piçûktiyê da, wî li gundê xwe zarokên ku wî nedîtibûn û nas nedikirin, di sîmayê ra derdixistin ku kîjan zarok ê kîjan malê ye. Bi heldana hen çavkaniyên devkî, ev jêhatibûna nasbertiyê ji mîrasa kevnêşopiya pezxwedîkirinê da maye û ji nivşekê derbastî nivşekê din bûye. Malbata Simo jî mîna pir malbatên eşîra Beraniyê bi sedan salan keriyê pêz bi xwedîkirine. Pezê ku piraniya wan mîna hev gewr bûn. Meriv dikanî wan, tenê di saye şan û nişankên wekî nîskeke hûrik yên li serûçavan wan, ji hev derbixe. Di wexta xwe da, xwediyên keriyên pêz û şivanên wan bi sedan berxên ber kozê yên ku piraniya wan mîna hev bûn di sayê nişanên veng da ji hev derdixistin û dizanîn ku kîjan berx ya kîjan mîyê ye. Kesên nasber, sed berxî gewr yek bi yek nas dikirin û dizanîn ku kîjan berx ya kîjan mîyê ye. Simo jî bi vê kulturê mezin bûbû. Wî gêna nasbertiyê wergirtibû. Ji ber vê bû ku, wî di rûyên her kesê ku wî nas dikir da parçeyek ji rûyên merivê ku wî li gundê xwe nas dikir didît û bi vî hawî pir kesên yad bi wî nas dihatin.

Almanya, 04.09.2014

Gotûbêj

Nûh Ateş, kurdekî Anatoliyayê ye. Ji destpêka salên 1970'î û vir li Almanyayê dimîne. Bi dirêjahiya salan wek çalakvanekî ji bo mafên kurdên Almanyayê xebitiye. Niha yek ji nivîskarên kovara kurdên Anatoliyayê Bîrnebûn e. Li gel berhemên wî yê bi almanî û tirkî sê pirtûkên wî bi kurdî hene. Ateş xwedî pênûseke xweser e, di çîrokên xwe yên fiktiv ku wek pirtûk berî bi du salan bi navê „*Tayek Por*“ derketin de jî devoka kurdên Anatoliyayê bikartîne. Em bi Nûh Ateş re li ser çîrkên wî, li ser kurdên Anatoliyayê û tevgera kurd li Almanyayê axivîn.

H. Duzen: Kêk Nûh, keliya ku min xweşt ez ji bo vê hevpeyvîne bi te re bi-axivim. Ger ez ne şaş bim, te di nav peyvên re got „hema ne siyaseta be.“ Ew henek bû, yan bi rastî jî tu dibêji em babetê siyaseta li dervayî ve sohbetê bibêlin?

N. Ateş: Ez xwe wekî siyasetmedar nabînim û zûva ye ku ez ne di nava karê siyasî yê rojane û rêxistinî da me. Merema min ji wê gotinê ew bû ku giraniya sohbetê ne li ser siyaseta be. Bê siyaseta jî nabe. Meriv bixwaze jî nika ne siyaseta bitûn li dervayî sohbetê bi-hêlê. Tu behsa çî biki, seriyekî wê digihê siyaseta.


H. Duzen: Belê, ji xwe de siyaseta ne di navenda ve sohbetê de be. Gelek caran mirov jî hin nivîskarên me dibihîze ku karê wan afirandina berheman e û naxwazin qet nêzikî siyaseta yan babetên ku seriyekî wan digihêje siyaseta bibin. Hey

babet vebûye, tu ji kengî û vir de ne di nav siyaseta aktîf de yî?

N. Ateş: Di salên 1970/80î da min karê siyasî û komeletî kir, pirtir di refê rêxistina Hevra, PSK, KOMKAR û AKSA (Yekîtiya Xwendekarên Kurdistan li Dervayî Welat). Ji sala 1986an vir da ez ne di nav siyaseta rêxistinî da me. Ji sala 1997an vir da ez nivîskarê Bîrnebûnê (kovara Kurdên Anatoliyê) me.

H. Duzen: Kêk Nûh, tu wek xortekî 22 salî sala 1970yî ji bo xwendinê hat Almanyayê. Ev bû 44 sal tu li Almanyayê dimîni. Ji ku ye Nûh Ateş, kurdekî alman, almanekî kurd an xwedî nasnameyêke din e?

N. Ateş: Nasname têgiheke piralî ye û guherok e. Hêlên wê yê etnîkî, kulturî, sosyal, erdnîgarî, dînî û hwd. he-



ne. Ji hêla binemalî û etnîkî da ez kurd im, bi gotina cîwarê me ez kurmanç im. Li ber destê dê û bavekî kurd, li gundekî kurd ê li nava Anatoliyayê mezin bûme û bi zimanê kurdî hatime şîretkirin. Kurdê Anatoliyayê, kurdê Tirkîyê, kurdê Almaniyayê jî parçeyekî nasnameya min in.

H. Duzen: *Fi bo te „Welat“ tê çi wateyê?*

N. Ateş: Cih û warê ku meriv lê xwededayî, mezin bûye, zaroktî û xortaniya xwe lê derbaskiriye. Cih û warê ku mermalî dost û yar, jin û zaroyên meriv lê dijîn. Cih û warê ku meriv lê kar dike û debara xwe dike. Cih û warê ku meriv lê serbest û sermest e... Xwedî

welat bûn mafê her miletekî û ferdên wî ye. Mafê miletê kurd û her ferdekî wî ye ku bi welatê xwe, nav û nişanên wî serbilind bibe.

H. Duzen: *Bi tevahî têgeha „kurdên anadolê“ tê bikaranîn, kî ne kurdên anadolê, li ku dijîn, ji ku hatine wan deverên ku lê dijîn?*

N. Ateş: Ez û nivîskarên kovara Bîrnebûnê „Kurdên Anatoliyayê“ bi kar tînin. Ez dikanim pîrsa te ya derbarê kurdên Anatoliyayê da wer bibersivînim: Di serdema osmaniyan da, bi dehan eşîrên kurd bi keriyên xwe yên pêz va ji Kurdistanê berbi nava Anatoliyayê kişiyane. Demekê ew di navbera Anatoliyayê û Kurdistanê da çûne û hatine. Paşê, di nivê duyemîn ê sedsala

19an de, ew di çarçeveya sîyaseta cî-warkirina eşîrên koçber li ser bingeha fermana dewleta osmanî li nava Anatoliyayê hatina bicîhkirin. Desthilata osmanî dixwazt ku bi bicîhkirina eşîrên koçber wan baştir têxe bin kontrola xwe û wergirtina eskeran û berhevkirina bacê hêsantir bike. Bi dirêjahiya salan, pêdapêda li Anatoliyayê, zêdetir li bakûrê Gola Xwê koloniyeye kurd pêkhatiye. Koloniyeye qasî sêsed gund û bajarokan û zêdetirî sêsed hezar nîstecîh. Kurdên Anatoliyayê, meriv dikanê bibê, ji her aliyê Kurdistanê hatine. Lê piraniya wan ji heremên başûrê Kurdistana Bakûr hatine û bi konfederasyonên eşîrî yên wekî Reşî, Canbegî û Şêxbizeynî va girêdayî bûne. Ew bi sê zaravayên kurdî (kurmancî, dimilkî/zazakî û şêxbizeynîkî) deng dikin. Piraniya wan musulmanê heneffî ne. Ev koloniya ku ez qalê dikim di nava hududên bajarên Ankara, Konya, Kirşehir û Aksarayê da ye, ango li Anatoliyaya Navîn e. Divê bê gotin, li herêmên din yên Anatoliyayê jî Kurd hene.

H. Duzen: Di serdema Qomara Tirkîyê de ji gelek kurd di çarçeveya "mecburi iskanê" de ji anîn Anatoliyayê, ne wisa? Jê pê ve kurdên piştî serhildana Dersîmê yên nefîkîrî hene.

N. Ateş: Erê, rast e. Lê evana malbat bi malbat yan jî ferd bi ferd hatibûn nefîkîrin û bicîhkirin. Nimûne kurdên ku piştî serhildana Dersîmê hatibûn nefîkîrin serbestiya wan tune bû û bê îcaze wan nedikarin bigerin an kar bikin. Kurdên dema osmaniyan ne werbûn. Her çi qas ew li gor fermanên serdarên dewletê hatibûn bicîhkirin jî, ew xwediye erdên fereh bûn û li hêla pezxwedîkirinê karê cotkarî û tucariyê jî dikirin. Her eşîrekê ji xwe ra gund ava kiribû.

H. Duzen: Dîbêjin Şêxbizînkî bêtir dişibe bi Soranî, gelo rast e?

N. Ateş: Ez ne pîsporê zîmanê kurdî û zaravayên wî me. Lê li gorê hin lêkolînan şêxbizeynîkî bêtir nêzikî soranî û feylî ye.

H. Duzen: Biqasî ez agahdar im, kurdên musulman ê sunne yên li Kurdistananê şafî ne, lê yên ba we heneffî ne. Mezhebê heneffî yê Osmaniyan bû, lê Kurdên li kurdiştanê bi piranî ew nepejirandin. Bi min wisa tê ku helewesteke li dijî asimlasyonê bû ev. Ger ew rast be, mirov dikare bibêje kurdên anatoliyayê asimlasyonê zîman û çandê nepejirandine, lê ya mezhebê ewqas girîng nedîtine?

N. Ateş: Biqasî ku ez hayadar im weha ye. Mimkun e, wekî te goti be, lê kêngê û bo çi kurdên Anatoliyayê mezhebê heneffî pejirandine ez niza-

nim. Agahî derheqa vê mijarê da li ba min tunin. Her çiqaş derbeyên asîmîlesyona xwaribin jî, wan ziman û çanda xwe ya kurdî parastine.

H. Duzen: Hejmareke mezin ji kurdên Anatoliyayê li welatên Ewropayê wek Almaniyayê û Swêdê dijîn. Ev jî bi koçberiyêke duyemîn pêk hatiye.

N. Ateş: Erê. Qedera dused salî ji koça jî Kurdistanê şûnda, di serdema komara Tirkîyê da, kurdên Anatoliyayê carek din dest bi koçkirinê kirin. Ji salên 1960 vir da bi dehhezaran Kurd ji Anatoliyayê bi rêya koçberî û penaberiyê barkirin welatên Awropayê. Komeke mezin ji kurdên Anatoliyê li Ewropayê bi cih û war bûye. Li hin bajarên welatên wekî Swêd, Danemerk, Elmanya, Awisturya, Îswîçrê koloniyên kurdên Anatoliyê hene.

H. Duzen: Lî ba we navên mîna Hecî, Nebî an Nûh zehf xuya ne, ev jî ku tê gelo?

N. Ateş: Di malbata min da Heciyek û sê heb Nûh hene. Nizan im çima. Di-be ku hingê ew navinan li rewacê bûn. Lê niha li wan derên me, ev navên klasîk û dînî pir kêr bûne. Navên kurdî yê modern li pêş in. Wekî Rojhat, Botan, Alan, Mîran, Rêzan, Hêvîn, Berfîn, Zozan û yd.

H. Duzen: Û „Xaço“?

N. Ateş: Navê Xaço, li ba me tune. Ez bawer dikim, navêkî bi eslê xwe ermenî ye.

H. Duzen: Lê belê naveki te ji Xaço ye, tu Nûh î yan Xaço yî?

N. Ateş: Herdu jî. Ez Nûh im, ji ber ku mezinên malbatê ev nava li min kirine. Xaço navêkî ku ji paşê da, li Almaniyayê li min hatiye zêdekirin. Hevalê min Bilal Görgü ev nava bi yarenî li min kiribû û wer li ser min ma û bû nasnavê min. Min jî vî navî hez kir û ez wî jî bi kar tînim. Yanê ez Xaço me jî. Li Almaniyayê pirtir bi vî navî dihêm naskirin.

H. Duzen: Pirtûka te ya çîrokan Tayek Por berî bi du salan derçû, pişre jî te jiyana Ehmedê Elê nivîsand, xuya ye teqawîdbûn baş bi kêrî te hatiye?

N. Ateş: Erê, teqewîdî bi kêrî min hat û tê. Min sê kitab bi kurdî derxistin: *Tayek Por*, *Nivîsên Per û Ehmedê Elê*.

H. Duzen: Di pirtûka Tayek Por de 16 kurteçîrok hene. Di kêliya xwendina hinan jî wan de min ji xwe pirsî bê fiktîv in an berhevkerî ne. Tu kari jî min re bibî alîkar?

N. Ateş: Kurteçîrok ne berehevkerî ne. Ewê lihevani (xeyalî, fiktîv) ne. Helbet tesîr û para jiyana rast û bûyerên qewimî jî, kêr û zêde li ser heye.

H. Duzen: Lî gel ku piraniya temenê te li Almaniyayê derbasbûye jî çîrokên te bahsa gund dikin. Tu tu carî fikirî ku tu jiyana koçberiya li Almaniyayê jî binivîsî?

N. Ateş: Erê. Berhema bi navê Ehmedê Elê-Jînenîgariya Koçberekî Kurd Li Almaniyayê-mînakek e. Di kovara Birnebûnê da rêzenivîseke min li ser navê «Şopên Dema Xatirx-waştinê» heye û dom dike. Di wê da behsa mijara koçberiya li Almaniyayê di jiyana şexsekî kurd yê fiktiv da tê kirin.

H. Duzen: Zîmanê te bi kar anîye jî, dihêle ku mirov bikeve şikê bê çîrokên Tayek Por fiktiv in an gelêrî ne, ji ber ku zîmanekî heremî hatiye bikaranîn. Sedemê ku piştî ewqas berhemên kurdî derketine jî te ew zîmanê ku bi piranî pê tê nivîsandin bikar naniye çi ye? Ger her kes bi devoka gundê xwe yan herema xwe binivîse emê çawa bighêjin zîmanekî standart?

N. Ateş: Zar û zaraveyên cîwarî di eslê xwe da makzîmanê meriva ne. Zîmanên standard, pirtir zîmanên çêkirî ne. Ew zîmanê dibistan û dezgehên resmî û civatî ne. Her çiqas hewldan û pêşketiyên bi qedir di vî warî da hebin jî, meriv nikane îro qala kurdîyeke standard a seranser bike. Ji bo kurdîy-

eke standard divê lihevkirinek li ser wê hebe û perwerdeya bi kurdî hewce ye. Mixabin hin em negihêştine vê qonaxê. Ji ber vê, ez nivîsandina nêzikî yan di bin bandora zarava û devokên herêmî da diparêzim û hewce dibînim.

H. Duzen: Ligel ku raşt e, kurdiyeke standart ê seranser tune ye jî, li ser tiştinan libevhatinî hene. Xebatên Celadet Alî Bedirxan ên li ser zîman bîngêh tî girtin û van bişt sîh salên dawî gelek berhemên berbiçav derketin. Bi dehan televîzyonên bi kurdî weşanê dikin, bi sînor be jî, li Bakur li hin zanîngeh û dibistanan kurdî tê fêrkin.

N. Ateş: Gotinên te di cîh da ne. Dîsa jî nivîsandina nêzikî zarava û devokan sewa parastina heyîyên kulturî û zîmanî û teşwîqkirina xwandin û nivîsandina bi kurdî bi taybetî li herêman bi kêr e. Nivîsandina bi kurdîyê standard an jî ya nêzikî kurdîyê berî berve zîmanekî standart, wekî ku te gotiye, li ser bîngêha xebatên Celadet Alî Bedirxan jî hewce ye, lê herdem ne ferz e.

H. Duzen: Mixabin min pirtûka Nivîsên Per nedîtiye. Mijar û navaroکا wê çi ye?

N. Ateş: Nivîsên Per ji meqele û kurtenivîsên li ser mijarên curbicur ha-

tiye dagirtin. Eger meriv bixwaze wan li gor beşên edebî parva bike, hingê birek ji wan dibe serpêhatî, bîranîn, yarenî, şîrove. Mijara hinan jî rabûn û rûniştinên civakî û siyasî ne. Mijarek jî kurmancîya ku li Xelika (gundê ku ez lê mezin bûme) tê dengkirinê ye û taybetî, peyv û bêjeyên wê yên cûda ne.

H. Duzen: Lî ku ye gundê Xelika?

N. Ateş: Xelika (bi tirkî navê wî Karacadağ e) li Anatoliya ye û bi ser qezaya Kulu-Konya va ye.

H. Duzen: Berî çendaki pirtûka te Ahmedê Elê derçû. Fînenîgariya koçberekî kurd li Almanyayê. Çima Ehmedê Elê?

N. Ateş: Ehmedê Elê kurdekî Anatoliyayê ye û li Almanyayê dijî. Karkerekî jî rêzê ye. Min ew di saye koçberiyê da nas kir. Sala 1975an, cara pêşî ez û Ehmedê Elê li Frankfurtê raste hev hatin. Di ser vê rasthatina min û Ehmed ra çel sal rabirt. Kurtegotî, ez Ehmed jî nêzik da û baş nas dikim. Me bi salan bi hev ra di bin bana KOMKARÊ (Federasyona Komelên Kurdistan Li Almanya) da kar û xebat kir. Ehmed pîr dixwast ku jiyana wî bê nivîsandin. Fikra nivîsandina jiyana wî, cara pêşî ji devê nasa wî ya alman, Dorisê derketiye. Ehmed çend cara jî wê ra qala zaroktî û serpêhatiyên xwe

kiriye. Wê jî gotiye, "Ehmed, çir dikî bike, van serpêhatiyên xwe binivîse yan bide nivîsandin!" Wî bixwe bi şîya nedikir. Xeberdan, xwandin û nivîsandina wî ya kurdî bikêmanî ye. Jiyana Ehmed tijî bûyer û serpêhatiyên balkêş û manîdar e. Nivîsandina jînenîgariya Ehmed mîna biyografiyeke bi elementên siyasî û civakî ji bo edebiyata kurdên Anatoliyayê û mijara koçberiya li Almanyê ji min va pêwîst û lêhatî xûya kir.

H. Duzen: Te rêbazeke balkêş bikaraniye; di devernan de pirsyar û bersîvên rastêraşt hene û di gelek deveran de jî bi alîkariya şiroveyan em ji jiyana Ehmedê Elê bêtir tiştan fêr dibin. Pêveka pirtûkê jî vê vegotina xweş re nebûye bar?

N. Ateş: Di pêvekê da, agahdariyên di derheqa kar û xebata KOMKAR û ya kurdên Almanyayê ji bo naskirina nasnameya kurd li Almanyayê hatine komkirin. Mijareke giring ya jînenîgariya Ehmed serpêhatiyên di derheqa eşandina wî ya ji avrûyên inkarkirin û piçûkxistina nasnameya kurdî da ye. Mijareke din jî hewl û xebata wî ya li hember nerindî û neheqiyên li ser nasnameya kurdî ye. Lewma min û Ehmed, me hewce dît ku behsa xebata KOMKARÊ ya ji bo qebûlkirina nasnameya kurdî li Almanyayê bi awayekî fereh bihê kirin. Ji ber vê ez

pêveke wekî barakî nabînim, bervajî ji bo xwendevanan bikêrhatî dibînim. Wê wekî danasandina armanc û encamên xebata Ehmed ya sîyasî û kom-eletî pêwîst dibînim. Lê hen dost û nasên min pêvekê mîna bar yan zêdey-iyekê dibînin. Ji nêrin û meremên wan ra hurmeta min heye.

H. Duzen: Keç Nûh, ger ez ne şaş bim, karê te jî di warê biyaniyên li Alman-nyayê bû. Ger te karîba hinekî bahsa karê xwe bikira.

N. Ateş: Ez di pir karên ji hev cihê da xebitîm. Lê 22 salên rabirtî yên dawî-yê, li wezereta Kar, Sosyal, Tenduristî, Malbat û Jinê ya Eyaleta Rheinland Pfalzê (Almanya) ku ji bo entegrasyo-na koçberan jî berpirsyar e xebitîm. Karê time ku ez tevê, di bin serdariya berpirsyarê koçberî û entegrasyonê yê eyaletê da, zêdetir şewirmeniya hiku-meta eyaletê di vê mijarê da bû. Ame-dekirina konzepta entegrasyona koç-beran û raporta salane ya hikumeta eyaletê li ser kar û barê entegrasyonê û finansekirina projeyên kêrhatî ji bo entegrasyonê karên wê yên serekî bûn.

H. Duzen: Nîha piştî ewqas sal li Al-manyayê û ewqas kar û xebat, ger tu li dû xwe mêze bikî, kirinên kurdan li Almanayê bi tevahî tu çawa dibînî.

Çi karîbûn çêtir bikirna, çi divê nekiri-na?

Nuh Ateş: Salên 1970 û 80î risk û be-delê xebatên sîyasî ji bo rêxistinên kurd û endamên wan li dervayî welêt jî hebûn. Li Almanayê jî sitemkarî û neheqiyên ku dewleta tirk li rêxistinên kurd û endamên wan kirî piştî derbeya lêşkerî girantir bûn. Desthelatdariya generalan bi hemû dezgeh û derfetên xwe yên resmî û veşartî û bi alikariya hevalbendên xwe hewl dida ku rê li ber rêxistinên kurd û nasîna nasna-meya kurd li Almanya jî bigre. Wê sûcên xwe diavêtin ser rêxistinên kurd û ew bi karê terorî û cihêxwaztiyê ta-wanbar dikirin. Kurtebirî, wê serdemê li Almanayê jî bo rêxistinên kurd û endamên wan heyamekî xeternak û vekêşiyane pêk hatibû. Sixûr û fitne-perstên rejîmê li ser plan û îşûkarên kirêtiyê bûn. Kurd berdidan kurdan û dixwaztin ku şerê navxeyî li serê wan bikin bela. Û hewl didan ku bi rêya terorize û radikalizekirinê wan di çavê raya giştî da piçûk û neçê bikin. Mixa-bin, ji avrûyên pevçûnên rêxistinên kurd ên li ser bingeha dijberiya ido-logîya çep a dogmatik, bi taybetî jî bi tehdît û hêrişên tund yên hin hêz û aliyan rê li ber lîstikên tarî yên rejîma generalan vedibû. Kurd li hemberî kurdan radibûn. Ji avrûyên şer û pevçûnên navxweyî li welat jî bûyerên

xerab diqewimîn û zîyanên mezin pêk dihatin.

Xwazika kurd li hemberî kurda ranabûna û rê li ber listikên hêzên tarî venekiribana û navûdengên kurda nehatiba neçêkirin. Duh û îro jî berî her tiştî divê kurd û rêxistinên wan şerê hevûdu nekin. Ji hebûn û cihêtiyên hevdu ra hurmetkar bin. Divê jî bo diyalog û hevkarîya nav kurdan da peymanek bê girêdan. Bê diyalogekî pîhêt û herdem û bê aştî û hevkarîya navxwe kurd nagihên armancên xwe û nikarin civat û welatekî demokrat, dadimend, aram û azad ava bikin.

H. Duzen: Ka em pêşî xebatên ku heta niha pêk hatine û serkeftin û giringahiya wan jî te bibhîzin.

N. Atêş: Almanya demeke dirêj, ji salên 1960î hetanî 1990î kurd nedinasîn. Sewa ku şîrikê NATO Tîrkiye hêrs nebe û berjewendiyên bazîrganiyê bi wê ra zîyan nebînin wê guh pê daxwazên kurdan û rêxistinên wan va nedikir. Koçberên kurd bi salan jî maf û xizmetên wekî dersa zimanê kurdî, serbestiya navên kurdî, şewirmeniya sosyal û bernameya radyoyê bi zimanê dê bêpar man. Yanê maf û xizmetên ku ji koçberên din ra rewa dihatin dîtin û bi baca koçberên kurd jî dihatin finansekirin, bi salan jî koçberên kurd hatin êvişandin.

Di sayê xebat û berxwedana rêxistinên kurd û piştgirên wan ya di warê kurdnasiyê da îro rewş û merc hatine guhêrtin, encamên berbiçav hatin bidestxistin. Almanya henbihen, gavbigav kurdnas bû. Nimûne, îro bend û astengiyên li ber navên kurdî rabûne û li çar eyaletan îmkana dersa kurdî heye (Bremen-1993, Hamburg-1994, Niedersachsen-1995, NRW-Nordrhein Westfalen-1997).

H. Duzen: Tê bîra min berê karmendên daîreyên fermî li Almanyayê navên kurdî ne dipejirandin, dema min keça xwe Evîn qeyd kir jî, telefoni sefaretê Tîrkiyê kirin, ji ber ku sefirê tirk hizirî ku "Evîn" jî peyva tirkî "ev" (mal) ku "mala te" wek "evin" tê nivîsandin, navê Evîn pejirandin.

N. Atêş: Navên kurdî û dersa zimanê kurdî di rastiyê da du daxwaz û nîşanên pir giring in. Divê giringî û wateya wan, bi taybetî ya dersa zimanê kurdî jî bo qedirdayîna nasnameya kurdî, geşbûn û gihêştina şexsiyeta zarokên kurd, bixwebawerî û entegresyona wan herdem li ber çavan bihê girtin. Ji ber vê jî, ji niha şûnda divê xebat bigiranî jî bo armanca berferehkirina dersa kurdî be û bi hevkarîyeke xurt bihê birêvabirin. Pêwîste tunebûna îmkana dersa kurdî, bi taybetî li eyaletên wekî Hessen, Baden

Württemberg û Bayern mîna kêmasiye-ke cidî bihê dîtin.

H. Duzen: Gelo li eyaletên wek Niedersachsen, Bremen û Hamburgê ku di salên 1990î de bi sînor be jî dersên kurdî hatin dan, azmûnake çawa bû, kurdan karibû sudeke baş jê bigirtana?

N. Ateş: Bidestxistina maf û derfetan tiştek e, lê bikaranîna wan û ji wan istifade kirin tiştekî din e. Meriv dikare bibê ji imkana dersa kurdî kêr sût hat wergirtin. Pirtir kurdên êzidî di vê mijarê da hestiyar in. Xwastina dersa zimanê kurdî heq e. Lê divê xwaztin û kirinên meriva lihevhatî bin. Mixabin xwastin û kirinên rêxistinên kurdên koçber lihevnehatî ne. Şaşî û kêmasiya piraniya wan ew e ku, li ba piraniya wan kurdî ne zimanê ragihandinê ye. Ew di karê komeletî û siyasî da, di kombûn û konferensa da kurdî kêr, pirtir zimanê tirkî û almanî bi kar tinin. Divê êdî pêşî rê li ber vê lihevnehatiyê bê girtin û rê li ber bikaranîna zimanê kurdî bê vekirin. Pêwîste rêxistin, sazî û dezgehên kurdan kurdî mîna zimanê resmî bi kar binin û hînbûna wî bikin şerta endametiye.

H. Duzen: Ji hêla rêxistinê yan jî nûnertiya kurdên Almaniyayê rewş çî ye. Ger em niha û salên 1970/80yî ku tu

bêtir di nav van karan de bû bidin ber hev, em dikarin çî bibêjin?

N. Ateş: Kurd li Almaniyayê îro bi hejmar, kanîn û zanîn, bi rêxistin, sazî, dezgeh û bi koma piştgirên xwe va xwediyê hêz û potansiyaleke fereh in. Bêguman bandora hêza wan dikane û divê hîn kêrhatî bibe. Wekî ji kar û kampanyayên rêxistinên kurd li Almanya tê xuyakirin, maf û xizmetên ku rêxistinên kurd daxwaz dikin bi piranî wekî yan nêzikî hev in. Ji ber vê jî, helwest û hewlên hin şexsiyet û aliyên ji bo pêşvebirina hev girtin û hevkarîya rêxistin, sazî û dezgehên kurd li Almaniyayê bi perspektîfa banrêxistinê li ser himê berjewendiyên hevbeş ên civata kurdên koçber, divê giring bîn nirxandin.

H. Duzen: Nêta te ku tu bi tevahî vegerî heye?

N. Ateş: Ji ber şerdên malbatî niha ne mimkun e.

H. Duzen: Vê dema dawî rojeva kurdan bi tevahî germ e. Bi taybet Rûdanên li Başûr wek bidestxistina Qerkûkê û plankirina referandumeke ji bo damezirandina dewleta kurdîstanê, kelecaneke mezin xîştîye nav tevahiya kurdan. Tu rewşê çawa dibînî?

N. Ateş: Rewşa nû ya Iraqê rê li ber bicihkirina madeya 140 ya makzagona Iraqê vekir. Yanê derfet heye ku cih

û warên kurd yên ku li dervayî herêma Kurdistana otonom mayî dikanin ve-gerin ser Kurdistanê. Ji xwe ew deve-
ran niha ji aliyên hêzên peşmergeyan va tên parastin. Biryara referenduma serxwebûnê jî di cih da ye. Ev ji bo beyankirina îradeya kurdên başûr nişan û pengaveke giring e. Bi vê gava-
vetine deriyê qonaxeke nû vedibe ji bo avakirina sistemeke konfederalî li giştî Iraqê û dewleteke kurd li li ser axa Kurdistana Başûr. Cihê gotinê ye, ev
prosesa nû li Iraqê û li Kurdistana Başûr ji metirsiyan jî bi bar e. Kurdis-
tan Başûr dibe cîranê DAÎŞê. Malikî û Îran kurdan tehdît dikin, Turkmen li Kekukê statuyeka bi parastineke nav-
dewletî (di bin garantoriya Tirkiyê da) dixwazin. Divê ihtimala şerê navxweyî li ser bingeha nakokiyên navbera hêz û
partiyên kurd, bi taybetî di navbera PDK û PKK da û bi kişkirin û sorki-
rina dewlet û hêzên neyar neye paşguh kirin.

H. Duzen: Dr. Nebî Keşen, kurdekî anatoliyayê û hevalê me herduyan bû. Berî here ser dilovaniya xwe bi çend heftiyên te, rahmetî û min me hev li Hamburgê dît û me şevê ji yên Hamburgê bi hev re derbas kir. Ew diyariyeke zehf xweş bû ji bo min. Gelo tu kari bîranîneke xwe ya bi rahmetiyê Nebî re wek diyari pêşkêşî xwînerên me bikî?

Ev Gotûbeja ji aliyê nivîskar Husen Duzen va hatiyê çêkirin û roja 05.07.2014an da di malpera BasNew da hatiyê weşandin

N. Ateş: Erê, wekî ku te gotî, wê êvarê tu, Nebî û ez, em çûn li nava bajarê Hamburgê geriyên hetanî devdeve si-wê. Me wexteke bi kêf û xwaşî derbas kir. Dûv ra Nebî û ez çûn Kopenhagê teve şenahiya komeleya Încowê (qese-beke kurd li Anatoliyayê) bûn û çend rojan li wir man. Elî Çiftçî jî li wir bû. Me li wir wexteke rind bi hev ra û bi dost yarên li wir va derbas kiribû. Li vegehinê, bi rê da, Nebî bi heyecan qa-la projeyeke ji bo Birnebûnê dikir. Wî dixwast ku em li ser kurdên Anatoli-yayê yên li welatên Ewropa dosyayêkê amede bikin. Mixabîn nebû nesîb.

Nebî li Încowê hate dinyayê û mezin bû. Li Încowê di telebetiya xwe da dest bi karê şoreşgeriyê kir. Bi gruba Riya Azadî re ji bo sosyalîzmê û azadiya miletê kurd kete nav kar û xebata siyasî. Li piştî derbeya eske-riyê, ew jî mîna bi hezaran kurdên din kete riya xerîbiyê û hate Alma-nyayê. Li wir jî ew teve kar û xebata azadiya milete kurd û heq û azadiyên koçberan bû. Bi rû da, wî kar û xe-bata zanyarî û nivîskarî jî dewam kir. Dem hat ew bû nivîskarê kovara Bîr-
nebûnê û dest bi nivîsandina kurdî kir. Heyfa Nebî, ruhê wî şad be!

H. Duzen: Sipas ji bo vê sohbeta xweş
N. Ateş: Ez jî spasî te dikim.

Ezidiler, inançları ve tarihleri

Prof. Dr. İlhan Kizilhan

Özet Ezidiler Kürttür ve anavatanları ile politik ve sosyal anlamda aynı kaderi paylaşmaktadır. Etnik veya dil yönünden değil, inanç kimliği üzerinden tanımlanan küçük bir Kürt topluluğudur. Türkiye, Suriye, Irak ve eski Soyvetler Birliği'ne dağılmış olan bu topluluk, genellikle çiftçilik ile hayvancılıkla uğraşır.

Prof. Dr. İlhan Kizilhan

Kürt bölgelerinin İslamlaştırılması dalgası ile onlarda da bölünmeler meydana geldi. Kürtler'in büyük bölümü İslam dinini benimsedi.

Kendilerinin dünyanın en eski dininin üyeleri olduklarına inanan Ezidilerin büyük bir kısmı Güney Kürdistan'da yaşamaktadır. Dünya genelinde yaklaşık olarak 800.000 bin ile bir milyon arasında Êzdinin yaşadığı tahmin edilmektedir.

Çalışma amaçlı göçlerin başlaması ile Orta Avrupa'ya, özellikle de Almanya'ya yerleşmişlerdir. Yaklaşık 100.000 Ezidi, Almanya'da yaşamaktadır.

Giriş

Din mensuplarının telafuz ettikleri şekli ile "yezidi", "izîdi" veya "ezdayı", "êzdi" terimleri Kürtçe'de "beni yaratan", yani yaradan ve tanrı anlamına gelmektedir. Ezidilik bir bütünlüğe ve

tek tanrıya inanır yani monoteist bir inançtır. Tanrıya, Ezidilikte "Xweda" denir, kelime anlamı ise; "kendini yaratan"dır^[1].

Tanrıdan sonra, Yahudilik, Hristiyanlık ve İslamda da adları geçen yedi melek gelir. Bu melekler, Ezidilerin günlük dualarında yer alırlar. Yedi meleklerin başında Tausi Melek yer alır ve tanrı tarafından dünyayı gözlemleme ve özellikle de Ezidileri korumak ile görevlendirilmiştir. Ezidilik inancında tanrı aslında pasif bir rol oynamaktadır ve Tausi Melek tanrısal yetkilerle donatılmıştır. Tausi Melek dışında başka kutsal isimler vardır: Şeh Adî, Şeh Assin, Şeh Şems, Şeh O Bekir, Şeh Faxradin ve Şeh Sijadin.

Güneş ve ay ezidilikde kutsaldır. Şeh Şems güneşi, Şeh Assin ise ayı sembolize eder. Ezidiler bu iki doğal elementin tanrının ışığını oluşturdu-



Etnik veya dil yönünden değil, inanç kimliği üzerinden tanımlanan küçük bir Kürt topluluğudur.

ğuna inanırlar. Her ezidi, dünyanın yatarılışına minnettarlığı göstermek, tanrıyı ve ezidilik inancını anmak için yılda üç gün (Aralık ayında) oruç tutmalıdır. Ayrıca her ezidi yaşamında bir kere Güney Kürdistan'da bulunan kutsal yer olan "Laleş a Nuranî"yi ziyaret etmelidir.

Ezidiler, etik ve ahlak, doğru ve yanlış, hak, doğruluk, bağlılık, merhamet ve sevgiye evrensel prensipleri olan bir inanç sistemine sahiptirler [2].

Ezidiliğin tarihçesi

Ezidiliğin dini tarihçesi, kürt halkının genel tarihinin bir parçasıdır. İnançlarından dolayı farklı şiddete maruz kalmış olsalar da aslında bu kürt halkına yapılan zulümdür [3].

Arapların 637 ve 1246'da Kürtle- re savaşımı, Moğol baskınları ve zo-

runlu asimilasyonlar Ezidilere büyük zararlar vermiştir. Ezidiler "şeytana tapanlar" olarak adlandırılmışlardır. Hatta onların Müslüman bir tarikat ve damgalanmış oldukları iddia edilmiştir. Baskılardan dolayı Ezidiler dağlara doğru çekilmişler ve diğer gruplar ile ilişkileri kısıtlanmıştır [4]. İnançları din adamları tarafından sözlü olarak devam ettirilmiştir. Bu nedenle ezidilik tarihi, sözlü tarihtir ve inançları ile ilgili çok az yazılı belge bulunmaktadır [5].

Bu nedenle komuoyu Ezidilik hakkında kısıtlı bilgiye sahiptir. Anglosakson literatüründe 18. yy'dan beri bazı araştırmacılar Ezidilik inancı ile ilgilenmişlerdir. Alman dini topluluklar sözlüğünde Ezidiler; "hazin, ahlaklı şartlarda yaşayan kabile" olarak tanımlanmaktadır. Ayrıca İslam dini sözlüğünde (1941);

“ezidi güzel, bağımsızlığın verdiği öz güvene sahip ve genellikle kuvvetli vücut yapısına sahip uzun ve kıvrıkcık saçlı bir insan tipi. Başları örtülü olmayan kadınlarının özgün yüz çizgileri vardır. Eskiden Ezidiler kendilerini dışarıdan gelen şiddet baskınlarına karşı cesurca savunan, korkulan isyancılar ve yağmacılardı. Sözlerine bağlılıkları ve vefalılıklarından dolayı düşmanları tarafından da takdir edilirler. Becerileri ve çalışkanlıklarıyla bahçe ve tarla işçiliği ve hayvancılıkta komşularından daha üstündürler. Özellikle bireysel temizliğe verdikleri utandırıcı özenle diğer Kürtlerin kirliliklerinde göze batmaktadırlar” denilmektedir^[6].

Ezidiler, sayısız mitolojik açıklamalar dışında, Ezidilik tarihinin başlangıcı ile ilgili kesin bilgilere sahip degiller. Ezidiler inançlarının insanlık tarihinin başlangıcından beri var olduğuna inanırlar. Tarihi kaynaklarda İ.S. 7 yy’la kadar “Ezidi” kelimesine rastlanmamıştır^[7]. Bin yıl başlangıcı ile birlikte Müslüman din adamları ve tarihçiler tarafından “Ezidi” tanımlaması kullanılmaya başlamıştır.

Örneğin yazar Damalgi, dini cezaların (fetva) Ezidilere karşı geliştirildiğini, çünkü müslüman bilginlerin 855 yılında ezidi inancının,

Müslümanlığa karşı olduğuna inandıklarını belirtmiştir^[8].

10 yy.’da arap tarihçi Al-Samani (1166) kitabında Al-Ansab (The Genealogies) Ezidileri, Halwan-dağlarında (Güney Kürdistan) yaşayan mataryalizmden uzak bir topluluk olarak tarif etmektedir. Yazar kitabında ayrıca Ezidilerin, Ommayid-Halife Yazid Ibn Muawiya’ya bağlı olduklarını belirtmiştir. Bu yanlış iddia günümüzde bile hala bazı kürt topluluklarda benimsenmektedir ve bu, Ezidilerin baskılara maruz bırakılmalarına bir neden olarak gösterilmektedir^[9].

Özellikle Alevi toplumunda bu yanlış bilgiden dolayı Ezidilere karşı bir tepki oluşturulmuştur. Günümüze kadar bazı Şii ve Aleviler, Ezidilerin Muhammed’in halefi olan peygamber Ali’yi, Yazid Ibn Muawiya’nın yandaşları olarak öldürdüklerine inanmaktadırlar. Ezidilerin, Yazid Ibn Mauwiya ile olan tek yakınlıkları isim benzerlikleridir, bunun dışında bir bağlantıları yoktur. Yazid Ibn Muawiya Arap ve Müslümandı, Ezidilik ise Kürdistan’lı bir inançtır ve Ezidiler o dönemlerde arap ülkelerinde yaşamadılar. Son kırk yılda diasporada yaşamları başladıktan sonra Ezidiler ve Aleviler arasında gerçek anlamda

yakınlaşma başlamıştır ve ön yargılar azalmaktadır^[10].

Ezidilere karşı yürütülen savaşımalar

Ezidilere karşı yürütülen en kanlı savaşımalar 1671 yılında Osmanlı Mufti Ahmed Mustada Abu Al-Imadi tarafından ve daha sonra ise 1832 yılında Rawanduz hükümdarı ratafından gerçekleştirilmiştir. Bu nesilden nesile aktarılan kollektif travma, günümüzde hala Ezidi toplumunda anlatılmaktadır. Ezidilerin şeytan'a taptıkları görüşünü savunan birçok Müslüman bilgin, bunu da Ezidi inancında kutsal olan Tausi Meleğin, tanrıya isyan eden baş melek olduğu iddiası ile açıklamışlardır^[11].

Osmanlı İmparatorluğu, Ezidilere karşı inançlarından dolayı bir savaşım yürütme ile ilgilenmemiştir. Tam tersi hatta bazı Ezidi soyluları, Osmanlı imparatorluğu tarafından yerel yönetimlere getirilmiştir. 1514 yılında Sultan Selim bir Ezidi olan Seyh Izzeddin'i, yeni Halep valisi olarak 1539 yılında ölümüne kadar Kürtlerin emirliğine getirmiştir. 1534 yılında Kanuni Sultan Süleyman Farslara karşı kazandığı zaferin ardından, Dasini aşiretinden Ezidi Husseyin Bey'i Erbil (kuzey Irak) valiliğine atamıştır. Ayrıca yine Dasini aşiretinden

ezidi Mirza 1640 yılında Sultan IV. Murat'ın ordusunda önemli bir rol oynamaktaydı. Osmanlının, Bağdat'ı ele geçirmesinde ve Farsların geri çekilmelerinden Mirza sorumludur. Bu nedenle Mirza, Sultan tarafından Musul valiliğine getirilmiştir. Ezidileri valilik vb. pozisyonlara getiren Sultanlar genellikle ortadoks Müslümanlardı^[12].

1872 yılında Osmanlı İmparatorluğu çıkardığı bir kararla ezidilerin askerlik yapma zorunluluğunu kaldırdı ve 1872 anlaşması ile yezdiliğin temellerini tanımıştır.

Osmanlı İmparatorluğu'nun parçalanması ile Ezidilerin büyük kısmı bugünkü Ermenistan'a kaçıp eski Sovyetler Birliği'nin Kafkas bölgelerinde yaşamaya başladılar. Birinci Dünya Savaşı'ndan sonra ve 1923'te Türkiye Cumhuriyeti'nin kurulmasından sonra, Ezidilerin ülkesi bölüştürülerek parçalandı. O zamandan beri Ezidiler, Türkiye, Irak ve Suriye ile eski Sovyetler Birliği'nde yaşamaktadır^[13].

Ortadoğu'daki diğer dinler ile benzerlikleri

Ortadoğu her zaman farklı etnik ve dini grupların etkilerini gösterdikleri bir bölge olmuştur. Bu nedenle yüzyıllar boyu benzer değer ve normların

oluşması kaçınılmazdır. Bu, Hıristiyanlar, Yahudiler ve Müslümanlar ile yakın ilişkileri olan Ezidiler için de geçerlidir. İslam öncesi dinlerin etkilerinin de hala Ezidilerde bulunduğu görülmektedir. Bu nedenle Yarasan, Mitras ve Zerdüştlük ile Ezidiliğin benzerliklerine kısaca değinelim^[14].

Ezidilik ve Yarasan (Ahl-i Haqq)

Hem Ezidiler hem de İran'da yaşayan Yarasanlar, Tausi Melek'e inanırlar ve inançlarında birçok benzerlikler bulunmaktadır. Bazı Yarasanlar, Tausi Melek'e Da'du da derler. Her iki inancın da melek sistemlerinde benzerlikler bulunmaktadır^[15]. Tek tanrıya Xweda (Khuda) inanırlar ve inançlarında Kürtçe konuşan yedi melekleri vardır. Her iki din de bazı melekleri için benzer isimler kullanırlar, örneğin; Cebrael, Mikail, Azrail ve Esrafil^[16]. Çilmêr olarak adlandırdıkları başka bir grup melek ve azizleri de vardır. Bunlar, yarasanlarda da benzerlik gösterdiği gibi 40 kişilik kurucu meclis dünyevi ve dini konularda kararlar alır. Yarasanlar gibi Ezidilerin de iki kutsal su kaynakları var, "Beyaz çeşme" (Kaniya Spi) ve "Zımzım"^[17]. Yarasanların kutsal su kaynakları ise; "Buza çeşmesi" ve "Hanita çeşmesi".

Ezidiler ve Yarasanlardaki bu kutsal su kaynaklarının temelleri büyük olasılıkla su tanrıları inancına dayanmaktadır. Avesta'da yeraltı su tanrısından söz edilmektedir^[18]. Windschman'a (1856) göre bu su "köpüren, güçlü saflığın simgesidir. Su kaynağı ise, suyun bilindiği anlamda değil, Ahura Mazda'da belirtilen tüm bitkilerin, hayvanların ve insanların verimliliğine vesile olan, ilahi anlamı ile tüm yeraltı kaynaklarının bağlı olduğu ana kaynağın kişileştirilmesidir^[19].

Dünyanın yaratılması konusunda da hem Ezidiler hem de Yarasanlar, 'inci teorisini' benimserler. Buna göre esas inci patladı ve onun parçalarından daha sonra dünya oluştu. Kainat tarihinde ilk kez o zaman ruh ve madde birbirinden ayrılmıştır. İnci diğer İran halklarında da önemli bir rol oynar. Bilincin doğuşunun sembolü olarak kabul edilir ve aynı zamanda bekareti de sembolize eder. Tıpkı bazı Ezidi söylevlerinde olduğu gibi Yarasanlarda da yerkürenin bir boğanın veya balinanın (Gamasi) boynuzlarının üzerinde durduğuna inanılır. Adem ve Havva'nın yaratılışlarında da benzerlikler var. Ezidiler gibi Yarasanlar veya Ahl-i Haqq da Arap fetihleri ile zulümüne maruz kalmışlardır.^[20]

Ahl-i Haqq da ruh göçüne ve böylece de ölümden sonra insan ruhunun yeni bir insan veya hayvan vücuduna geçtiğine inanırlar^[21]. Ahl-i Haqq yaradanın baştan beri kulları ile doğrudan bir ilişki içinde olmak istediğine inanırlar. Ölümden sonraki yaşam inancını aslen Hinduizm ve Budizmden almıştır. Daha sonra ruh aktarımı teorisi Ahl-i Haqq inancının önemli bir parçası olmuştur. Ahl-i Haqq kendini kullarından saklayan ve gizleyen bir tanrıya inanmaz.

Ahl-i Haqq inancına göre tanrı ilk insan Adem'i yarattı ve aynı zamanda ona dünya üzerinde kendi ilahi gücünü verdi^[22].

Yaradılıştan önce ne okyanuslar, dağlar, ovalar, gök, su, ateş, toprak ne de hava vardı. Büyük bir boşluk hüküm sürüyordu. Yaradan kendi gücüyle "Ya"dan (boşluk) bir "dorr" yarattı ve dorrdan kendi ışığı ile dört meleği yarattı. Ezidilerde "Ya" tanrının ismidir, dorr ise "Dir" olarak geçer ve küre veya inci anlamına gelir^[23].

Ezidiler ve Mitras

Başka bir hipoteze göre ise, ezidilik inancının elementleri Mitras inancına dayanmaktadır. Mitras, "Yazata" denilen ve yardımcı anlamına gelen yedi

tanrı veya meleğin başıdır. Mitras, Zerdüşterin tanrısı "Ahura Mazda" ile aynı değerdedir^[24]. Eski İran'da büyücüler, din adamları mitras yani güneş tanrısı için dualar geliştirmişler ve bunları halkın içerisine yaymışlardır. Zerdüşt eski İran dinlerinde reformlar yaptığında, Ahura Mazdaya en yüksek rol verilirken, Mitras daha alt bir pozisyona yerleştirilmiştir. Ancak buna rağmen mitras hiç bir zaman tam anlamı ile gücünü kaybetmemiştir. Zerdüştlük inancına göre mitras karanlığın ve ışığın güçleri arasında bir aracı gibidir. Böylece Mitras yeryüzünde yaşayan tüm yaratıkların kaynağıdır; onun düzeni altında hayvanlar çoğalmış, yeni nehirler oluşmuş ve insanlar da sağlıklarının ve yaşamlarının tadını çıkarmışlardır. Başka bir deyimle Mitras, Zerdüştlük inancında güneşin sembolü idi^[25].

Mitras ile Ezidilik inançları arasında aşağıdaki benzerlikleri sayabiliriz:

- "Ezidi" kelimesi büyük olasılıkla "Yazata" kelimesinden gelmektedir ve bu kelime eski İran'da hem Mitra inancı için hem de melek anlamında kullanılmaktaydı.
- -Mitraslarda olduğu gibi Ezidilerde de Şeyh Şems tarafından sembolize edilen güneş kutsaldır.
- Ezidiler, Şeyh Adı'nın reformlarının

başlangıcına kadar Şemsani (güneşe tapanlar) olarak da adlandırılırlardı.

- Ezidilerin bayramı “İzid“ Aralık ayının sonuna denk gelmektedir ve bugünde ateş yakılır. Mitraslarda Aralık ayının sonunda Mitrasın doğum günü olarak kabul ettikleri bayramlarını kutlarlar. Onlarda da ateş yakılır. Her iki inançta da ateş yakmak benzer önemli bir role sahiptir.
Keyerl bi min va da !-

Xofê girte ser bavê, wî bi lez diajot,
kur di destê wî da helm berdida bi zehmet
bi ax û wax gihêşte hewşa malê;
can ji kur kişiya li hembêza bavê.

Şeqe

Seyfi Doğan

Rojê şemiyê, danê êvarê. Telebên gundî me yê ku li Kulekê dixwandî, di du mektebê re, li kelekê Şell Petrol ku li ser rîyê gundî mê, kom bûn ku herin Xelika. Me xwe da bendê wesîteyên ku terin gundî me, an jî di gundê me re derbas dibûn.

Demsal payîza dereng e. Rojê zer. Terlên zer. Axa dûnê zer. Ezmanî hişin wek çavên keçên kej. Demê heyiyê li gor biharê û zivistanê.

Em ê xenê nî ku emê ku herin gundê xwe. Ba malbate xwe. Ba heval û cîranên xwe. Ji sirgûniye xelas bibin. Azad bibin. Me, bîriya bihnê gundê xwe û dengên nas kiriyê.

Min, ji dîmenê gundî me yê ku ji neqevê baxa da xuya dikirî, pir hezdikir. Germîyêkê xwe li min dipêça. Min xwe li ser dûnê û ewle hîsdikir. Dûmanên ku xwe ji pacên ji kerpîçanda hedî hedî dirêjê asûmanê dikirin, hîsên harmonî û xwebawer didane min.

Çend wesita, di ber me re derbas bûn. Me dest jê re hildan ku dawestîn, lê kesî xwe ji wan deren nekir. Roj, berve rojava, bi lez lût dibû. An jî bi me wisa dihat. Me demeke kin pa bi şunda, me qerar da ku em ê pêya bi rê kevin ku hîn ronîyê û dev neketîyê şevê, xwe bi gund gihînîn. Navbare gund û

Kulekê, bi peya du saet in.

Hewayê sérin e. Ez im, Usê Şêmlî ye, Heskê malê Eşê Qulik e, Bêremê Mihî Usif e, Huskê Sadê ye. Em ê bi lêz pi rê terinî ku xwe zu bi gund gihînî. Em ê bi rê da henekan û haye kilaman dikinî.

Em hîn di kanîyê Hemî Bêzê ku di qîrarê zozanê Bekir ra ye, negehiştinî, erebeka hespan li me zêda bû. Li ser erebê çend însan hebûn û di dest wanan da tîfingên neçîrîyê, ew ê ji Kulekê bûn.

Me, bi wanan re henek kirin û ketin ru wana û min bi wana re got; hûn ne neçîrvanên baş in. Hûn nikarên kerguhêkê jî necîr kin. Demekê me bi wanan re henek kirin bi şunda, min ji nişkave got; ez şewqê xwe bavejim hewa ka hûn dikanin lexin an na.

Min şewqe xwe avite hewa û wanan hemiyê bi hevdûre nişanê şepkê min kirin û sacme barandin. Şewqe min, li hewa firî û dekete ber lingên min. Şewqe min bibû elek û bêjing.

Min, bawer nedikir ku ew ê nişan hildin şewqê min. Ew ji min, bi salan mezin bûn. Ez î duwazdeh salî bûm. Diçûm ortaokulê sinifa yêkê.

Min ew şewqa, bi çî zehmetan kirîbû! Mejo û canî min dizane. Pere

dibûn, şewqe nedabû. Şewqe dibû pere nedibûn! bê şewqe bûn, sûc bû! Cezayî xwe yî heyê! Xayîni yê! Mekteb, ji min re wek garnizonêke eskerîyê dihat.

Em herroj, serî sibê, ji hêftê şeş rojan, beri ku em di sinifan kevin, li ber mektebê dikatinî rêzê û di ber mexliman re derbas dibûn. Yên ku kemasîyên xwe wek şepqê û qerewat tebû ji komasîyê teleban vedikatindan û heqeret pê dikirin. Ew heqaretan li min pir biqehr dihatin. Min pir caran, ji bo ku quta di xwe negihenim û heqaretan nebihîzim, xwe ji mektebê badida.

Ez rojakê çûm ba Ûsî Elî Mehmed û rica kir ku ew, bi bavê min re bibejê ku bavê ji min re perên şewqê bişîne. Dora dine rê, roja pencşembê li tenefûse çûm ba Xalê Ûs. Wî, perên ku bavê min ji bo şewqê şandin dane min.

Ûsî Elî Mehmed, wê wextê li Kulekê wek wekîldoz û daxwaznamenivîskar kar dikir. Buroya wî, li kelekê merkez İlkokulê bû. Ew dera nuha bûyê navanda Kulekê û çiyê Şaradariya Kulekê.

Xalê Ûs, qeytana navberê gund û Kulekê bû. Kî dibe ma bibe, bi Xalê Us disikini. Namên ku insanên Xelika ji dervayî gund da, ji malbet, heval û merlixiyê dişandin bi navî Xalê Usî Elî Mehmed bi rê dikirin û li ser zêfê wek adres "Yusuf Taşci eliyle Karacadaxê Köyü Kulu Konya" dinivisandin. Xalê Ûs, ew mektûbana, li xwedîyan belav-



Şamlî Zexê Xoce (Şahin Gündoğdu)

dikir.

Ji her telebekî re welîyê ku li Kulekê kar dikir an ji mala xwe li wir, pewist bû. Xalê Us, wekîliyê hemî telebên ji Xelikan Jor bû.

Xalê Us, însanekî qelender bû. Nazê me lê dibirî. Em, pir caran dicûn buroya wî. Me xwe li wir li gund hîsdikir û însanên gund didîn. Pir caran diçûn wir ku xwe li kulekê ewle hisbikin. Dişlikê me û hewniyê me li wir dihat.

Xalê Us, her êwarê, li motorsikleta xweya merqa xwe wespa, sîwar dibû û file xwe yê xwarinê dida terkîyê xwe û tajote gund. Wî, ji xwarinê xweş û pak hez dikir. Ji bo ku ew herroj diçû gund, xeberê wî ji gund hebû û de û bavên teleban, bi wî re îhtiyacên lawên xwe dişandin.



Ûsî Elî Mehmed
(Yusuf Taşçi)

Rojên îna, bazara Kulekê dibû. Li ser Atatürk Caddesî yê Firoşkaran, malî xwe pêşkeş dikirin. Wê rojê, sibê zu berî ku mekteb destpêbike rabûm û çûm bazarê. Ez, li nav bazarê epey gerîm û min şewqêfiroş dît û şewqê xwe kirî. Wexta min ê ku şewqekê ji xwe re helbijêrim tune bû.

Dema ku ez vedigerîyam mal, min li ser rî ya xwe, li ber dükana wî, Apê Şamli dît. Ew jixwe bawer wek mîrekî ji mîran dabû ber tîrejên rojê payizî. Kinc û merasê wî yê qîlî reş, li ser wî dibirikîn. Dükana wî di "kapali carşiyê da bû". Çarşî nu ava kiri bûn. Bi me pir modern dihat. Apê Şamli tiştên bakkaliyê difiro.

Wexte ku Apê Şemli, ez ditîm got; va çi lez û bez e! Xêr e, te dîne serê sibê, li ser xwe teng kirîye. Min ji Apê Şemli re, qala hal û heqeta xwe kir. Ew bi derdê min re eleqeder bû. Mala wî ava be, çi kemasîyên me dibûn, dixwest

caraser bike.

Telebên gundî me û gundên kur-mancên doraliyê Kulekê, li ba Apê Şemli deftere xwe hebûn. Yanê bi deyn, xwarin, çay û şekerî xwe jê dikirîn.

Min li ser deftera me yê hevpar, ihlamur, şekerî qehwê û sana yağ kirî vegeyîyam mal. Mala me gozek oda bû. Me di xaniyê Remziyê ji gundî Germikê kirê kiri bû. Xaniyê Remzî, ji du qatan bû. Li her katekî du oda hebûn. Hemî oda dabûn kirê. Di odekê da telebên gundî Omera, di odên din da jî telebên ji Altîlerê û Çöpliyê diman.

Ez, Heskî Malê Eşê Qulik, Hamîtî Male Mahko û Mehmîkî Malê Oskê li ba hevdu diman. Me, hertiştî xwe bi xwe dikir. Kevaniyê me Heskî Male Eşê Qulik bû.

Xwarin û vexwarina me, bi piranî wek hevdu bû. Sibê ihlamûr û qozîyê bi sana yağê, bi nîvro qozîyê bi rûnî mîye û şiv; piranî zad dibû.

Çîrok

ŞEMŞÊ

Min ew çîroka li yadê xwe çawa bihîstiye derbas nivîsê kirîye. Lêbelê min çîrok bi deng kirina gundê xwe, Kelhasan nivîsand.

Ersin Taşkiran

Yek hewû yek tinewû. Li zemankî berê, li deraka dûr malbateka bi heft geda hewû. Bavê wan gedana miriwû. Her heft gede, gîştik bira bûn. Xuşkê wan bira tinewû. Dakê wan heft bira zari mawû li bawê van, hînik bawê van nemiriwû. Heft bira zikê xe û dakê xe pir rind têr dikirin. Diçûn li ormên dar dibirîn, dihanîn li gundê xe difrotin. Xastina wan bira ma xuşkêk wan hewûya. Îsyan dikin li ber dakê xe. Li dakê xe re diwên em dike herin çiyê. Em êdin li wir nê, em dike li wir bimên. Li dakê xe re diwên wextêk çelik hat dûnê, xewer bi me de. Dakê bira diwê ez dike çito xewer bi we dime. Bira diwên ki çêlik bû kêçik li ser xêni fiştankî darxîne, ki ew bû lawik şalkî darxîne. Ki bû lawik em nê, ki bû kêçik em e werin. Dakê bira qebl dike, diwê tamam û heft bira terin çiyê. Bi dar bera malkê xwe çêdikin. Edin li wir dimînin. Her ro terin dara dibirin û difroşin. Li ser ra êpê

wexit derbas diwe. Çêlik tê dûnê, çêlik kêçik e! Dakê bira pir şadiwe. Li cîranê xwe re diwê here li ser xanî me fiştankî darxîne. Cîran jî lê dipirse çima, sebeb çiyê? Dakê bira li cîrên ra dirumê qal dike. Cîran tere fiştankî darxîne. Li fiştên digere digere nawîne. Xe şaş dike tere şalkî dardixîne. Dakê bira jî bîr kirîye, li cîranê xe ra qala hatinê nehatinê gede xe nekiriye. Bira di navbera xe da birangî engî bi çûk tim tim dişinin; ma li ser xanîyê wan bindire; ka fiştan e, ka şal e... Birangî engî çûk rokê tere dindire, çi bindire; li ser xanîyê wan şalkî hatiye darxistin. Birayî çûk tere xewer dide brê mezin. Xeft bira nê hinde dakê xe nê malê xe. Li ser ra êpê zeman desbas diwe. Dak rêya gedên xe çavdike lebelê heft bira da, yek bile nê. Dak navî kêçikê Şemşê lêdike. Şemşê radiwe mezin diwe, diwe kêçikik azib, kêçikik delal, diwe xezalek. Rokê bi hevalên xe va li derkê rudinin. Di navbera

wan da tiştik derbas diwe. Herkes sond duxe. Yek li ser bawî xe, yek li ser xuşkê xe, yek li ser birangî xe, yek li ser kal pîrê xe sond duxe. Sire tê Şemşê. Ev jî li ser golikê xe yê sor sond dixê. Li wir ki heye giştik pêdikenin, le wê ra qerfa dikin. Şemşê radiwe ser nig xe digirî tê malê xe. Tê hinde dakê xe, lê dipirse çima kesî me tinnê. Dak jî her tiştî lê ra qal dike. Şemşê şaş diwe çibike. Boxçekî xe girêdide derdikeve rê. Dike here hinde bre xe. Tere çîye gî der dar û bere. Êpê tere, li du rêkê zor da mesafekî dirêj qetdike. Li wê şîwa, rast malkê tê, pacê xe duman dikir. Tere dikeve wê malê. Ferq dike ew mala bre xe ye. Şemşê xe vedişêre di derik şevreş da. Bira tên mal şîvê xe dûxin, rodikevin, sada disa terin. Şemşê malê brên xe berefdike, şîvê birayên xe dide ser ocêx, xe dîsa vedişêre. Bira tên mal pir şadiwin, şaş jî diwin. Bi xe xe diwên tiştî sîrrê li me qelîvî. Rok neye du ro neye. Herçik tên mal şîvê xe hazir e, dorê xe berefkiyê. Birangî engî çûk pir fena ye. Rokê li mal dimînê, xe di pacê da vedişêre. Çavdike, dipê, eceba çi çexdiwîye di malê da. Şemşê derdikeve xeyatê, birangî çûk şaş diwe. Çîçkî li Şemşê sêr di-

ke, dû ra bi gûliyê Şemşê ra digrê, Şemşê dibizde. Qal dike, diwe ez xuşka we me. Bira îna nake. Şemşê qala cîranê jî dike, bira dû vê ra famdike, qebûl dike xe li xuşka xe werdide. Birayên mezin êvarî tên mal dirumê li wan ra jî qal dikin. Giştik pir şadiwin. Tevhev rodikewin û sada radiwin. Bira, ji Şemşê ra diwên dikqatke, ma ocaxî te neçûlise. Derik tu lê arkî bine tinnê. Diwên dermekeve der, divî ormanî da milqetî pir eceyip heye, xunê merîya vedixê goştî merîya dike. Bira terin dara bibirin. Şemşê tene li mal e. Wextêk Şemşê dorê malê berefdike, pisik tere li ser ocêx da dimize. Şemşê şaş diwe çibike. Bre xe êvarî werin, e vestîyane, xîşhalkî bune, ye birçîne. Gul bre xe nake, derdikeve der. Dike here arkî buwîne. Digere digere, çexdiwe çexdiwe, dumankê diwîne. Xe lê digrê wir da tere. Tere, ki malkê li wir e. Şemşê nizane ev mala milqetî xunvexar e. Şemşê li qêpi dixê, milqet qêpi lê vedike. Şemşê li milqet arkî dixaze. Milqet bi kêf dikenne. Tere arnî tîne, Şemşê şadiwe. Şemşê çik çexdiwe gavkê tawê, milqet bi gûlyê Şemşê ra digrê. Milqet devî xe tîne ber gepirê Şemşê, nefese xe ye pîs berdide ser,

bi gukî Şemşê dimije. Şemşê çexdiwe paş xe milqet lexdike, milqet ser piştê gêr diwe. Şemşê bi şîpkê dibezze, direve tere. Şemşê tu li paş xe nandire, bi xewa desbas diwe tursa ra. Şîp şîpê bezandinê xe devam dike. Tip tipê dilî Şemşê. Di rê da tiliyê xe xun dike. Milqet xunêk rijî bin dike, Şemşê tekîp dike. Şemşê digê mala xe, qêpi li ser xe kilît dike. Milqet bi şîpkê tê ber qêpi, solix solixe milqet. Xe li qêpi dixwe, qapî nakeşte. Şemşê hindir lê diqete, qîr qîr, bar bar e. Milqet li Şemşê ra diwê; ki tu qêpi veneke, ez ê herim birayên te bikujim. Mil-

qet bi Şemşê dikene. Diwê tilyê xe yê qerkoçikê di qullê kilîtê ra ke, çiçkî xunê te vexim ez ê cibêlîm herim. Şemşê tilyê xe di qulê kilîtê ra dike, milqet xunê wê vedixe, milqet xeda tê û cidêle tere. Şemşê ser piştê dikeve di paş qêpi da. Birayên Şemşê êvarî tên mal; çi buwînî Şemşê mirîye. Birangî engî çûk tilyê Şemşê yê bi xun diwîne. Ferq dikin kî milqet xuşka wan kuştîye. Heft bira xe hazır dikin, necax xe digrên terin malê milqet. Yek bi junîkî, yek bi pikî, yek bi kûr digrên milqet parçê parçê dikin. Dikevin rê, terin hinde dakê xe."

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di *Birnebûnê* de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vî yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Şengal

Şengal bi tenê nîne
Ez jî Êzidî me
Huro Şengalî me

We dît
Sedsala bîst û yekan
Bin ax bû mirovatî
Li Şengalê

Dê û zarokên Êzid
Kal û pîr
Tî û birçî
Berê xwe dan çiyayê Şengalê

Li hember xeftarên DAIŞê
Mirovatî bêdeng
Şengal xemgîn e
Zarokên xwe carek din
Di sîngê xwe de vedişêrî ne

Herkes bizane
Axa Kurd û Kurdistan
Nabe yara çeçel û guran
Keç û xortên Kurd
Meydanê nadin wan xeftaran
Ser zinarên Şengalê
Banga wan;
"Berxwedan jiyane
An mirin an Kurdistan"

Mizgîn li te Şengal
Yekbûn çêkirin Kurdan
Xem neke
Aha li cem te ne
Bi tekoşer û çekdaran

Bitirsin birevin
Xeftar û çeçelên DAIŞê
Ew der axa mêra ne
Welatê Kurdan e
Şengal ê ji we re bibe gor û goristan.

Mem Xelîkan

PAKIJÎ

Seyfi Doğan

Osman Gundoğdu dema ku banga
paqijîyê di camîyê de dike

Foto: Seyfi Doğan



Şeveke tarî, em li derve runuştî
bûn. Asûman wiqas pak xuya dikir
û hêstirk dibirikîn. Baş e, ve hestir-
kek ku em li ser dijîn çima wiqas
gemarî û qilêrî ye. Gemariyê dînê
bes ne tenê qelerîya bermayîyê ye.
Dînê bi neheqîyê, zordariyê û
kedxwarîyê jî gemar û qilêr bûyê.

Çend heval, me li ser wê mijarê
munaqêşe kir. Her hevaleyê dîtinê
xwe peşkeş kir. Em li ser babetekê
gehîştin hevdu ku em ê dest bi pa-
kişê nav gund bikin. Dînê pak ki-
rin teneke durê lê nav gund pakîş
kirin di bin destê me da ye û qo-
lay tê şunê. Dînê pak kirin nuha
zehmet e, qet nebe, em gundî xwe
bibirikînin. Yê ku ji hestirkên din

da me temaşê dikin; me bibêjin;
Xelika çiqas pak e û yê dibirike.

Me bîryar girt û carî tirmixê
(2014-08-04) em ê, saet çaran li ber
camîyê mehelê jor, bi hevdu gîştin.
Berî saet çaran em ê li camîyê û li
belediyê gund annons bidin ku em
ê dest bi pakîşiyê bikin.

Hesmenî Şemli sponsorîyê tu-
rikên naylon, lepikan û avê vexwa-
rinê kir. Belediyê jî traktora xwe jî
bo kişandine bermayê ku me kom
kirî amade kir.

Îsmet Kiliçalp jî foto muxabîrê
çalakîyê bû.

Em saet sisêûnîva, li ber camîyê
kom bûn û me annons kir. Anons,
Hesmenî Şemli kir. Saet li cara

me pakişî ji parkê hemberî camiyê destpêkir û heta kanîyê jêri pakişîyê berde-wam kir.

Gelek însan teva çalakîya me bûn û li nav gund însanan, bi rojan qala vê çalakîyê kirin. Pîr însanên ku di pakişîyê da cîh negirtî bûn jî bi fikrên xwe yê mûspêt alîkarîya me û pes-nandîna aksîyona me kirin.

Stockholm 2014-11-11



Foto: İsmet Kiliñçalp



Ji çepê da rêza peşî; Seyfî Doğan, Yasin Akgül, İsmet Kiliñçalp, Nihat Kiliñçalp, Osman Gündoğdu, Hasan Bozkurt

Rêza paşî: Baran Kiliçkaya, Fehmî Yıldırım, Fehmî Yerlikaya, Fevzi Gündoğdu, Fuat Kiliçkaya.

Fazîletên entelektuela

Seyfi Doğan

Heqê herkesekî ye ku bîrûbewariyê xwe hebe. Mîrow divê, biguman û krîtîk dîtinan bipîvînin ku nezîkî rastîyan werin. Wê gavê, însan dikane nebaşîya û başîya fikran bibîne.

Mitewazî (nefsbiçûk)

Ronakbîr, gerek sîmorê xwe yê zanetîyê bizanê! Ji zanîne xwe zêdetir nebêje ku ez î zana me. Rewşenbîr, zêde îdîa neke ku ji her kesekî zêdetir dizane. Wîqasî ku merî pêdizani deng bike û binivisîne. Ronakbîr divê pêşhikmî nebe.

Cesaret

Gerek entelektuel îdraq bikin ku fikrên û ramanên ku li dij dîtînen wî/wê jî bin, bi çavên bêalî lê binêrin û bi rastîyeke samîmî wan fikran bikolînin. Fikrên ku însan îro li dijî û bi însên eceb û komîk tî, dikanin sibê bi qîmet û rûmêt bibin.

Empatî

Xwe di şunê kesên din kîn, bi çavên û hişên wî/wê tiştan fêhm bikî. Pir hêsa ye ku însan bibêje ku di ser dîtînan

û fikrên min re dîtînan û fikir tunen. Gerek rewşenbîr, jî bîr nekin! Bi xwe û xwe re bibêje; fikrên min çend çaran çewt bûn û çend çaran min tiştên şaş nivîsîn û gotin.

Duristî;

Dibe ku entelektuel xwedîyê fikrên xwe derkevin û çawa îspatên, dîtînan, fikir û ramanên kesên din dixwezin gerek jî xwe jî bixwezin. Gerek, hevnegirtiyên û şaşîtyên xwe qebl bikin.

Înad

Dîtînen ronahî û rastî her çiqasî dijwar, asteng û bi zehmet bin jî, gerek ronakbîr wan li her cîh û dem bi kar bîne û jî bo ku buyeran dûr û dirêj fêhm bike, biceribîne.

Rastî

Gerek ronakbîr, her fikran û dîtînan wek hevdu micmela bikin û wan fikran û dîtînan li gor fikrên, hês û întresên xwe nebipîvînin.

Sîyarê Têrika -3

Dr. Mikailî

Reva Osê

Osê di şevda reva xu plankiri wû, wî çend kinc û hin hacetên xarinê kiriwûn zik hekîbekê. Çend ro berê ji yaylê kerwaneka Zafranci ya ji Helebê zafran û hin tiştên din lê bar, ber vi Senbolê diçû. Wî bi wan va hînikî sohbet kiriwû, bi niyeta hûkirina ku, eceba ew te-rin kuderê?

Ji wan derxist ku, ew ber vi Senbolê terin û ew ê bi şev jî li Sivrihesarê bimînin.

Wî hespekî baş ji bo reva xu nişan kiri wû. Ku eşir ketin xewê, ew sivika, bêdeng rawû, heqîba xu avet ser milê xu, çû bi gemê hespî xu girt, heta ku ji nav kona derket lêşiyar newû, nedixwast bira kes heşar be.

Hendû ku inakir, dengê nehli hêsp nari tu kesî, ew bazda ser pişta hêsp û da tîzika.

Wek bayî surê di nav şevê da herikî û ber bi xevna xuva çû.

Wî berê jî rîya Sivrihesarê dizanî, kalî wî li wir medrese xandîbû û ew jî çend meha li vir, bi kali xu mawû.

Wî xu li çemî Gökpinarê girt, heta gihîşt çemî Seqarê qe ranewestîya. Li ber çemî seqarê sekinî, hespe xu avda, bixu jî haceta xu di, hînkî jî birçî bû

wû ,ji hewanê çîçkî nan bi pênnêr va derxist, xar ,dû ra Goşte rîşî kiriwû nav nêr, ji wê jî çend pari geskirin, goşt pirr hişk bû, ne diaht cûyînê, bi zorê di gewrîya wîda derbas diwû. Serda ji xu li ser zik direj kir, deve xu kir ava çêr û hînkî jê vexar.

Eşîr dê bav û bira, tu kes nedihat bîra wî, tenê tiştik difikirî; kelecana jîyana wî ya nû,meraqa Senbolê, çî ye wari serî wî ,heşe xu tenê bi wana va meşgûl bû.

Ji dûrva tujikê kilisa Sivrihesarê xanê kir. Ro jî hindik hindik ji paşgira da hildihat, pêşta soraxî, dû ra zeraxî bû û germa xu herder girt.

Li Sivrihesarê rum, yahudî û musulman tevhev dijiyan. Li paşî vî bajarokî zindare bilind û tûj wek di-varikî, bakura bajêr dorpêç kiriwûn.

Bajar hîn di xewê da wû, tenê çend kuçik û çûçikê ezmên payî bûn.

Wî xana ku kerwan lê diman dizanî, hesp ajot çû ber deri, ku hîn girtî bû.

Hespe xu li ber dêri bi singîkî va girêda, torbe kaye bi seri va kir.

Zike wî jî birçî bûwû...

Bîna nani sersêlê hat poz bivîlê, bi vê binê eşîr û kon hatin bîra wî, bîna



Mala Hecibegê, salên 1940i, gundê Mikaila/Înler

nanî tennurê, nanî ser sêlê, bina hevîri
teze, bînik ha tirş, teze û germ.

Osê gavekê xu dîsa li yaylê hîs kir,
te ye bigote nika diya wî ye bi quncîkî
cila, nivîna wî bikşîne û bane ke; Oso
Oso de rawi! Ro hat nivro, malneşe-
witîyo! Tu yî hîn di xewê da yî?

Bo yî wê diwêjin; Mala Hecibra-
ma ku radekevin, tu ye bê qey ew mi-
rine.

Osê bîra dîya xu kir, xembar bû.
Te yê bigota qey kevirîkî gir dane ser
dilî wî. Giranîk ket zik.

Yekî bê xeber paşva deste xu avêt
mila wî, ew venciqand; *Gardaş ne
arang?* (Bira te li çi meze kir?) Yekî
ziravî cermşevitî, çavqelişteke bû û ji
kûrahîyekê da li meriya mêze dikir.

Osê got ez ji rêka dûr tîm, ji xu ra li
şûnikê digirim. Him tişteki bixwum,
hîm jî dixwazim hinki bihna xu bi ber
xudîm, rakevim. Bi tirkîya xuyî ku li
Medresê hû kirî, pirsî.

Mêrik got; *Haa anladim, beni izle!*
(Min fehm kir, bi dû min di.) û li
benda bersiva Osê nesekinî û çû.

Osê bi telaşe da dû wî. Meri dika-
re biwêji li dû beziya.

Paş Kerwanserayê da çex bûn û ji
derîkî çûk û tari da ketin zik Kerwan-
serayê. Kerwanseray çarqoli, gî xanî
bûn, li jor ji bo yî meriya, li jêr ji bo
yî heywana şun hewûn, bihnek germ
û gennî dihat poz bivîla meriya.

Bivîla Osê ku li yaylê tim bi hewa
pak tiji, ji xewê radiwû, xu bi vê bîne



Qonaxa Hecibegê, salên 1940î, gundê Mikaila/Inler

şaşkir. Ji nêrdûgane kevirda derketin jor û di quleka tarî da ketin odeka qilêr. Meriya tu tiştik ne didî, tenê hurhura çend denga dihat, le Osê tu kes neditî. tenê jor li bin asraxê, kullikê da hînik tava ro diket hundir.

Mêrik li kuncik da şûnik ra wî kir;

Oraya yativir, irahat degil emme yorgunlugunu atang!

(Xu li wir dirêj ke, herciqas ew ne rehet be jî, tu ye bihna xu bi berxu di!)

Osê bize xu pê hat, le pir westiya bû, xû avêt ser. Dest û ningê xu, çipe xu gî qerimî wûn, giran bûwûn, çito xu avêt, wakina ji ket xewê.

Bi dengî merikî bi xu hesiya.

Lên qak qak, kerwan yola cixacak, cabix bişiler yî de sende gatil! Yohsam

yine yalnız gideng, yollar hirli hirsiz dolu, tekin deel!

(Rawi rawi! Kerwan ji bo yî çûyîne xu hazir diki, Ku tu bi wan va neçû, ne başi, Rê gi bi diz û eşkiya wa tijî yî!)

Os hema bazda bi telaşe beziya jêr, mêrik hinki nani hişk bi pênnêr va da destî wî, ew hema meşiya ber hespi xu çû. Merik jî li dû wî; *Hemşerim barayi virmeyi unuttun! Bura şirket hayriye deel!*

Wî ji xu fedi kir bi rûyekî sor, çex wî bû û got;

Telasdan unitmişim, qusura qalma!

Bi tirkîya xu yî neçê meçê...

Ji berika xu kîse pera derxist, bedela xu da merik.

Kerwan bi rêket, wî jî da dû wan.

Os digêje Senbolê

Qasi rokê rê çûn, berêvarê gihiştin berî Senbolê, aliye Anatoliyê. Ji dûr va tûjike Minara û kilisa xanê dikir. Her der dar û heşinayî bû. Ji ber ra jî çemikî fere, emma pir fere diherikî.

Os jê tirsîya...

Wî pir meraq dikir, ka paytexta Ali Osmaniya, Padişahê Alemê, bajarikî çito wû, merî xu çito bûn? Wana ye çito bi wî ra deng kirina, Wî ye li vir çi bikira? Ew pirsana gî di mejuyî wî da tevlihev digeriyan û heş li serî wî dibirin, ew gêj dikirin.

Le di rê da hînkî bi çend kesi din va deng kiriwû û ji wan hîn agahî hilgirti wû, ka ewe li wir here ku, li ku bimîni. Meriyê vê derê çi dixun, çi vedixun, çito radiwin, rûdinin. Ose çito li hember wan dengke, hereket ke.

Osê xu ji Senbolê ra amade dikir.

Yeki jê ra gotiwû;

Li wir medresa Xalidî Baxdadi heye, ew jî kurd e û Padişah pir ji wî hez dike, diwêjin ew ji mala Pexember tê û alimikî mezin e, pir dizani. Deriye medresa wî ji herkesî ra vekirîyi.

Te berê jî medrese dîyî, hînkî Tirkî jî dizani, tu hema herî wir li derî xîni. İnşallah ewe te hilgirin hundir!

Ew tişt ket heşî Osê, barikî giran ji ser piştê wî rabû wû, kêfa xu hat, ku ew bi kêf bû, tim klamek dihat ser

zîmani wî, kilama Horê û Hecikê va. A dilgirtina wan. A ku di şevên tarî û dirêj da li bin konna wî tim gudarî dikir û dibihist. Dest bi strandina klamekî kir.

Ooo beg yanîq oquyan deliganli, ben annamayoru emme hoşlaşiyoru! Kurdçe mi oquyon?

Bi tirkî ya aliye Engürü ye, pirsî yekî. (Tu pir bi şewat distirê, ez qe jê fehm nekim jî, min jê hezkirî!)

Hee.. got Osê.

Bi serî xu jî bersiv dîda. Dû ra ji xu fedî kir û bi fitikê kilama xu dewam kir.

Le pîr bi kêf bû. Hendû tîrsa ku, ewe li ku bimîne, ji dilî wî da derketî wû. Te ye bigota qey ew tere mala bavî xu.

Bi destî xu doya hespî xu mist da û ji ber xu da ji hespî xu ra got,

Em hatin! em hatin! Çave te ronî, te jî bare min, qehra min pîr kişand û westîya. Le em gihiştin wir, eze te qeşaxî bikim û turi te bi cehelî baş tijikim.

Osê berê da ji heywana hezdikir û tim bi wan ra deng dikir.

Ji ber ku; wî deng kirina bi meriya va ji xu qut kiriwû, ji wan direviya.

Hêsp jî, ji zîmanî wî fehm dikir û bersiva wî dîda.

Hesp hîriya û sere xu rast û çep bada, boça xu rakir, paş va li piştê Osê

da, bi sime xuyî pêşiyê erd kola...

Ew dihat wê manê ku hesp ji sîyarî, xadanî xu hez dike, kêfa xu tê.

Kerwan hat li aliyê anatolyê li ser taxa Çirpici çayiri rawestîya, li vir çend konê eskerî a Paytextê xanê dikirin, li ber wan jî leşkerên bi şûr û mertal dawastîya wûn, rime direj di desti wan da wûn. Ala Padîşah bi konawa daliqandî bûn. Leşkera kincê sor zer û renga reng li xu kirî-wûn, li serî wan jî kumên gir û spî ji kulev hewûn. Ji dûrva mîna dikên ser kuligê xanê dikirin, gîştik simêl bada wûn, rûye wan qe nedikenîyan. Meri li çavi wan jî dinêrî, wana qe li te mêze nedikirin.

Serokê Kerwanê ji hespî xû bazda jêr, xu gêr kir. Di bin çava da li dor paşî xu neri, tirrik bideng ber da, bexuda kenîya, bi saetan li ser hêsp herdera xu qerimî wû. Quna wi tevizi bu. Toza ser xu dawşand, tû desti xu kir û bi desti xu serçave xu pa kir, tûk bi simêla xuya jî da, simêl ber bi jorva nûr kir, wek qocî beranîkî kir. Sere xu bilind kir û doq doq, ji xu xaş, çû ber derî konî leşkera.

Ji wan nobedara ra tiştîni gotin, Nobedar ket hundirî kon û gavek şûnva derket û ew ket hûndir.

Wêngê usul bû. Kî ji anatoliye bihata Senbolê, bê destur nedikari di nav bajêr keve û ji bo bar û malî

xu jî mecbûr bedelek dida. Ji xencî vê jî wana navbera xu bi efserên Osmanîyan va tim baş digirtin ku, bira ewna ji wan ra rê teng nekin, muşkila dernexinîn. Hînik ji wan qumandan-an kurd bûn û kurd diçûn cem wan, kû bira alîya zimanda ji hev rindtir fehmbikin. Ji ber ku di nav imparatoriya Osmaniyanda bi sedan millet û ziman hewûn.

Sere kerwanê hat cem kerwanê, derket ser kevirêkî bilind û ban kir;

Me 100 zêr dan komandan! Li gor barî we û serî her heştir, hesp û kerekê eme vê pereyi di nav xu da berhevkin. Ka kê jêra çî dikeve, bira bîne bi min di. Eze biwim, bidim wî.

Wî bi zaniti ew pere hînkî zêde digot û hînik pere jî diavêt berika xu.

Herkesî pê dizanî, le nedixwastin vê eşkere ji wî ra biwêjin. Hînka sere xu leqandin, mûriz kirin, le para xu jî anîn, dan wî.

Os çû cem ew kesekî ji wî ra çûyî-na medresa Xalîdi Bexdadi binav kiribû;

Kekê ka ew medrese li kijan taxê Senbolê yî, eze çîto herim wir?

Merik bi desti xu alîye din a Senbolê ra wî da û got;

Garşi yakada, deniz kenarındaki iki minareli gozel, beyaz camiyi gorüyon mu? Oraya Eminönü Meydani dirler, caminin adi da Valide Sultan

camisi, Yeni Cami, de dirler. Oraya gidecen ve orada soracan.

(Li taxa dina behrê li hêla meydanê camiyekê diwîni, ew li ser meydana Eminönü, yê ye û jê ra diwêjin, Valide Sultan Camisi, yan jî Yeni Cami, ji wan bipirse.)

Os; E ka ez ê çito derbasî aliyê din biwim?

Merik; Li iskelê keştî hene, tu ye çend quruşa bi wan de, wanaye te biwin wir.

Os; Ka ez ê hespî xu çibikim?

Merik lê nêri, wala ez wê nizamim, tu dikari li vir derxîne firotinê.

Os bi fikra firotina hespî xu eşîya, ew hesp di zaroktiya wî da hevale wî bû, qehra wî kişandîbû.

Le wî jî dizanî ku tu çareyeka din tunneyî, ewe mecbûri wî bifroşe.

Çû cem serkerwan û ji wî ra ewa got.

Wî got; Ka bine vir ez carê lê mezekim, belki ji bo xatirê te, wî bifroşim.



Top û Xetica Hecibegê
Ev wêne li salên 1940î li gundê Mikaila/Inler hatiye girtin.

Çavên wî dibriqîn. Hîn ku Os tevî kerwanê biwû, hespî Osê bala wî kişandî wû. Hespêkê qir û seklawî bû. Ewqas rê beziyabû, dîsa jî tu nişana westandinê lê xanê nedikir, tunne wû.

Ez ê du zêrî sor bi te dim!

Osê buhaye hespa dizanin, lê çexkir;

Bedela vî hespi kêmtirin 10 zêrî ye!

Serkerwandar got: Tu dizane, mi dixast ji te ra rindîkê bikim, Tu ji mi ra hesp mesp lazim ninin! Ziviri û ber bi kerwanê çû.

Osê li dû wî qîrya; Ware ware, ez didim.

Mêrik xu ha giran giran çexkir û got;

Wallah tu kezenca min jê nawe, ez tenê dixwazim ji te ra rindîkê bikim.

Qe li rûyî Osê nedihêrî.

Du zêr di kefta wî da hazirwûn, dirêj Osê kir. Osê ew hilgirtin û kir beriya xu. Dilê xu pîrr eşiya bû.

Ji wî û rêhevali xu xatir xwast. Qe neçû hindê hespî xu, ku biçiya nedîkarî ji wî biqedî. Dizanî.

Heqîba xu avêt ser mila xu, şûrê xu yî ku li hêlê da daliqandiwû, duz kir, kince xu dawşand. Li bejn û bala xu mêzekir û ket rê, ber bi Üsküdarê va çû.

Üsküdar li hêla behrê, li pêş meydanîk hewû û wek bazarê bû. Qerebalexik mezin lê digeriya. Meri û ziman tevlihev diwûn. Li vir tiştîki bala Osê pîr kişandiwu; Jin gî di nav çadoranda wûn, meriya tu serçavê wan nedîdi. Ne mina eşîrê kurmanca bûn. Li eşîrê keç, jin û bûk serçav vekirî bûn, tenê jini pîr koftî kitan didan serî xu û şehîr li ber eniye dişidandin.

Os çû ber keştiyeka çûk û jê pîrsî ka ew terin aliyê din yan na.

Keştîwan yane qayîkçi got; bazde ser!

Ew lê sîyar bû, keştî li ser behrê mîna hellîka deliqîya. Osê ji tîrsa xu qe nedilivand û bi desta kêleka wê girtî bû.

Ew tîji bû şûnva du xort bi bêrên bi ber hatin, yek li pêşiyê, yek jî li paşiyê rûniştin û bi hevra bêre xu ra avê dan û dibirin, ew li ser avê ra xijdîwûn diçûn. Gavek şûnva Osê tîrsa xu anda bû ,şûna tîrsê kêfê girt. Ew mîna listîkekê bû.

Ku ew gîhiştin aliyê din, yekî ji wana benîk avêt taxê din. Merikî ew ben bi singekî gir va pêçand û girêda, dû ra bi wî benî ew bi berxu va kişandin.

Herkes bazda jêr. Os jî bazda. Çav tim li minara Mizgefta spî bû. Ji bo yî ku wê anda ne ke. Xu li wan girt û çû ket hewşê. Mizgeft gî bi kevra avakirîwûn, pîrr gir bû. Zarya ce didan gogercîna(kevok). Bi seda gogercîn li ezmên û li ser erdê xanê dikirin.

Deriyî mizgeftê ji darê û qasî 3-4 metro bilind wû. Çû ber deri û li zengulî deri xist.

Ji paş deri da denge gavi sivik û nerm dihat bîstine...

Û denge şivikkê li kêvir dikeve...

Ew ji bo yî Osê deriye qedera wî bû, ew deng jî denge qedera wî.

Serîlêdan

Ev kesên ku bixwazîn navê gund, belde, cih û warên xwe vegeerîn ser yên berê, yên esîl dikarin ev numûna serlêdanê bi kar bînin.

Başvuru dilekce örneği

Kulu, 29.09.2014

KULU KAYMAKAMLIĞINA

TALEPTE BULUNANLAR : Aşağıda isimleri, imzaları T.C.

kimlik no'ları ve adresi bulunanlar.

T. KONUSU

: Köyümüzün/mahallemizin eski

isminin alınması için gerekli

işlemlerin yapılması isteminin sunumu.

AÇIKLAMALAR VE TALEP:

Bizler aşağıda isimleri ve kimlik bilgileri bulunanlar, Kaymakamlığınız sınırları içerisinde bulunan Karacadağ Köyünün/mahallesinin sakinleriyiz. Ata-dedelerimiz gibi hepimiz bu köyde doğduk ve bu köyün nüfusuna kayıtlıyız.

Resmi kayıtlarda köyümüzün/mahallemizin ismi Karacadağ olarak geçmektedir. Fakat kurulduğu günden bu yana köyümüzün gerçek ismi "Xelikan"/(Xelikane Jor) dır. Ata-dedelerimiz baştan bu yana köyümüzün ismini böyle tanımladığı gibi, çevremizdeki köylerde yaşayan insanlarda böyle tanır, böyle bilirler. Köyümüzün tarihinde resmi olarak yetkililer tarafından verilmiş farklı isimler (.....Yalınayak, Karacadağ) olsa da halk arasında hep Xelikan olarak bilinmiş ve öyle tanımlanmıştır.

Dönemin başbakanı şimdi ise Cumhurbaşkanı olan Sayın Recep Tayyip Erdoğan tarafından 30.09.2013 tarihinde açıklanan demokrasi paketinde, eski köy isimlerinin iade edileceği ve mevcut alfabede olmadığı için kabul edilmeyen x, w ve q harflerinin kullanımına izin verileceği belirtilmiştir.

Köyümüz/mahallemiz kurulduğu günden bu yana hep "Xelikan" ismi ile bilinmekte ve halk arasında da bu isim kullanılmaktadır. Bu nedenle köyümüzün/mahallemizin kayıtlarda görünen "Karacadağ" isminin kaldırılarak gerçek ismi olan "XELİKAN" olarak teşçili için gerekli işlemlerin başlatılmasını saygı ile arz ve talep ederiz.

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres :

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres:

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres:

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres:

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres:

.....(T.C. Kimlik No:....)

Adres:

"Kesek tune ku jîyana min binivîse?"

Suphî Aydin

Pirtûka nû ya Nuh Ateş di nav weşanên Apecê, 2014 li Swêdê hat çapkirin. Di vê berheme da nivîskar serpêhatiyên Ehmedê Elê yê tije bi qehr, keder û xizanî bi zimanekî paqij û herîkî va tîne ber çavên xwendevanan. Careka din bi saya vê xebata hanê, angî ji du kitêba 'Tayekî por, 2012' dişan em bi derheqa kurdên ku li berî dused salan zêdetir waxt e ji Kurdistanê koçberê Anatolîya navîn bûne, dibin xwedîyê malûmatên cure bi cure. Min ev herdû pirtuk jî xwendin û ez bi xwendina wan herdû berheman şa û hinekî jî dilteng bûm. Sedemên şabûn ev in ku hevalemî min karekî weha hêja afirandîye û diltengbûn jî ji ber naveroka van pirtukan ê tije bi keder, neheqî û neçarîyê ne. Di pirtuka *Tayekî por* de şanzdeh kurteçîrok hene û ya *Ehmedê Elê* da jî bi giranî jîyana wî, bi vê yekê va girêdayî, ked û xebata wî ya siyasî di nav refên KOMKARê de hatine nivîsîn.

Helbet meriv gava li ser van bûyeran ku di nava rûpelên herdû pirtukan de hatine eşkere kirinê difikire, dibîne ku jîyana kurdan kêr zêde, li ku dijîn bila bijîn weka hevdû ne. Lê xwendevan bi saya van berheman

dibe xwedîyê ferq û curebûna jîyana koçberî û ya Kurdistanê. Zimanê kurdên koçber ên navçeya Anatolîyê jî hinek teybetmendiyên xwe hene û pêwîst e ew were parastin û firehkirinê.

Ez bi xwe ji wan ferq û cudabûna zimên de tehmekî xweş digrim û razîme ku ev devokên herêmî bêne bikaranînê ku wenda nebin. Ji ber ku ev yeka dewlemendî û qelewîya zimanê me pêk tîne.

Erê, ezê vegerim ser naveroka pirtukê, *Ehmedê Elê*; dayika Ehmedê Elê ji ber nexweşîyêkî dimire û ew hîna zarokekî du salî ye. Malbata wî neçar û xizan e, ew jî bi piçûktîya xwe da tevî birayê xwe yê ji wî piçûktir diçe ber berxan û golikan. Pêxas, birçî û belengaz, ser da jî ev dema zaroktîya xwe da nexweş dikeve û dibe keçel. Ev yeka jîyana wî bêtêhm dike û ji ber êşên serê xwe timî nav jan û kederê da ye.

Malbata wî ji ber neçarîyê mala xwe li Germikê bardikin diçin Enqerê, bicîh dibin. Ehmed û birayê xwe herroj zû, ji şefeqê heya êvarê simîtan difroşin, lê ew bi xwe ji wan simîtan yekî nikarin bixwin.

Ji duh smîfirotinê, ew rojnaman difroşe, cem koşkarekî, sola didûre, baxçeyekî da çay difroşê û ji konsolosê Berezilyayê bexçevanî dike. Çawa ku dibêjin ew û birayên xwe nanê xwe ji devê şêrê dertînin der. Ehmed diçe eskerîyê û piştî şeş mehnan wî derdixînin pêş hekîman, bona ku bejna wî kin e rapora pûç didînin û dişînin malê. Malbat wî dizewicîne. Piştî birayên wî yên sal mezin dukanekî meywefirotinê ji xwe ra kirê dikin û bi hev ra li wir kar dikin. Ehmed jî alîkarîya wan dike, piçekî rewşa wan baş dibe lê birayê wî di qezayekî tirafîkê da dimire û ev yeka dibe karesatekî mezin ji bona malbatê. Bavê wî dixwaze ev jina birayê xwe mehr bike û ev bi xwe jî zewicîyê jî. Ehmed ev yeka qebûl nake û duhre ev bi saya jinekî generalê ku muşterîya dukanê wanê ji xwe ra karekî li nexweşxana eskerîyê da dibîne. Axir em dirêj nekin, birayê wî yê salmezîn tê Elemanyê û ew jî ji bona ku bikaribe were Elemanyê xwe qeyd dike û di dawîyê de digihe-

je ev mûrada xwe. Piştî ev jin û zarakên xwe jî tîne Elemanyayê. Fasila duemîn jî ji Elemanyê derbaz dibe. Û ev jî him rewşa koçberî û zehmetîyên wan û him jî xebata sîyasî û çandî ku di nav Komela Karkerên Kurdistan a Bajarê Frankfurtê bûne, hatine nivîsînê. Ango xwendevan dikare bi saya vê berhemê bibe xwedîyê bûyerên sîyasî ku di nava çil salan de li Elemanyê, navbera kurdan de qewimîne, bixwîne

Karên baş ên ku meriv pê ser bilind û dilşa bibe û yên xirab ku dîsan em hemû pê êşîyane, şermezar û dilteng bûne.

Bi dîtina min ev kitêb hêjayê xwendinê ye û hêvî dikim xelkê me wê berhemê bikire, bixwîne û bibe xwedîyê zanîn û têgîhîstina hîn teybetmendiyên xelkê me yên navçeya Anatolîyê.

Tayek por, Nuh Ateş

Weşanên Apecê, 2012, Swêd

Ehmedê Elê, Nuh Ateş

Weşanên Apecê, 2014, Swêd

Numra kontoya me hatiye guhartin!

A nû ev a li jêr e:

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874



İstasyona Spångayé, Payıza 2014an, wênekêş: Seyfi Doğan